

Di 18'ê Gulanê de kîliyeke bêdengiyê

Pêşengê şehîdan Hâkî Karer wiha digot: "Ev bar ne tenê barê gelê Kurd e, barê min e ji. Ev riya ku hûn li ser dimesin ne tenê riya xelaskirina mirovên Kurd e, riya xelaskirina mirovahiyê ye ji, ji ber vê yekê, ez xwe wek endamekî malbata gelê Kurd dibînim."



Rûpel 10

Gerilla êrîş kir. 120 leşker hatin kuştin. Helîqopteran cemsê qereqolê yên vala bombe kirin

Rastî nayêن vesartin



Dema gel bi partiya xwe ve bê girêdan, tîrsa dilê wî dîskê. Edî ji kûçikan ji natîse; ne ji kûçikan resmî ne ji ji yên sivil.

Mafêñ mirovan û demokrasiya sexte ji reşikên Los Angelesê bipirsin Şoreş Dicle Rûpel 4

Mandela û nivîskarêñ Tirk Huseyîn Deniz Rûpel 5

Ewê destê xwe dirêjî PKK bikin, emê destêñ wan ji ber de jê kin Memo Nazî Rûpel 6

Dayikêñ me ne yên berê ne R. Cizre Rûpel 7

İlm ne haceta xapandinê ye Cumalî Cotkar Rûpel 8

Mestûrey Kurdistanî Mehabat Kurdi Rûpel 13

Niştimana xwe binas G. Çiyan-M. Kurdi Rûpel 14

Berpirsiyariya ERNK ya Ewrûpa: 'Dewlet dixwaze gel bitirsîne'

● Pişî bûyerên Newrozê, dewlet êrîşen xwe li dijî gelê me yê bê çek xwirt û tunde kir. Li aliyeke artêşa dewletê bi balafir û bombe yê din sivil û gundiyan dide bin işkence û wan di bin lêdanê de dikije

Pişî bûyerên Newrozê, ku dewleta Tirk tê de li hemberê dînyayê û awira gişî hate pîşange kirin, êrîşen xwe yên hovane li dijî gelê me yê bê çek xwirt û tunde kir.

Li aliyeke artêşa dewletê bi balafir û bombe yê din sivil û gundiyan dide bin işkence û wan di bin lêdanê de dikije, her wiha li aliye din jî dixwaze bi dînyayê bide qebûl kirin ku dewleteke demokrat û huma-nist e. Rûpel 15

Nelson Mandela: 'Ez piştgiriya têkoşîna gelê Kurd dikim'

Nelson Mandela (Rêberê Kongreya Neteweyî a Efriqê) di 17'ê Gulanê de li Osloyê bû. Li ser vexwendina (dawet) hikûmeta Norveçê, ji bo ku di cejna Norveçê ya neteweyî de besdar bibe, Mandela hate Norveçê. Weke ku tê zanîn, ji vir çend roj berê Mandela, xelata dewleta Tirk negirt û red kir. Li ser vê bûyerê gellek mirov û rîexistinê welat-parêz spasiya xwe ji Mandela re diyar kirin û ew pîroz kirin.

Li Norveçê komek ji alîgirê ERNK ê, di dêrê de pêç (qevd) ek gulê sor pêşkêse Mandela kirin û ew pîroz kirin. Mandela di vê hevdîtinê de kîfîxwesî û bexteweriya xwe diyar kir. Mandela di axaftina xwe di wiha got: "Ez ji bo azadî û mirovahiyê têdîkîsim. Ew kes û gelên ku li hemberî zordesî û nemirovahiyê rîdiwestin ez bi wan re me. Ez li ba gelê Kurd im. Ez piştgiriya têkoşîna gelê Kurd dikim."

- Gerilla 15 ê Gulanê erîseke mezin bire ser qereqolê Nirweh û Billeh, 120 leşker û 13 gerilla hatin kuştin. 40 leşker birîndar bûn. Gerilla 8-9 leşker ji esir kirin
- Pişî hilweşandina qereqolê her du qundan gerilla ji bi cemsê qereqolan ji cihê bûyerê dûr ketin. Helîqoptera cemseyê xwe yên vala bombe kirin, 10 gundi kuştin

Eniya Rizgariya Neteweya Nirweh û Billeh (Qilaban-Kurdistan (ERNK) Rêxistina Şimex) di bin agirê gerilla de têr hilweşandin. Di vê operasyonê de 120 eskerên Tirk hatin kuştin. Ji wan gellek ji hatin birîndar kirin. Di vê êrîşê de 19 lib (G3), 4 lib (A6), 1 lib (BCS), 5 (bêsim têlsiz), hejmareke bilind ji bombeyen destan û gellek fişek ketin destê gerilla. Li vir 13 gerillayê ARGK ê hatin kuştin.

Di belavokê de ev agahdarî têr dayin: "Gerilla di 15'ê Gulanê de li Şîrnekê bi navê 'berbang' û di destpêka bayanê de, operasyoneke fireh pêktîne. Qereqolê gundi

Nirweh û Billeh (Qilaban-Kurdistan (ERNK) Rêxistina Şimex) di bin agirê gerilla de têr hilweşandin. Di vê operasyonê de 120 eskerên Tirk hatin kuştin. Ji wan gellek ji hatin birîndar kirin. Di vê êrîşê de 19 lib (G3), 4 lib (A6), 1 lib (BCS), 5 (bêsim têlsiz), hejmareke bilind ji bombeyen destan û gellek fişek ketin destê gerilla. Li vir 13 gerillayê ARGK ê hatin kuştin.

Pişî êrîşen gerillayê, hêzên dewletê dikevin nav herdu gundiyan. Hêzên dewletê,

Rûpel 15

Li Kurdistanâ Başûr hilbijartîn

- Ji bo avakirina parlamentoeyeke otonom li Kurdistanâ Başûr hilbijartîn (seçim) çêbû. 7 partiyen Kurd, Ereb û Asûrî besdarê hilbijartînê bûn. Di nav van partiyen de partiyen herfî xwirt PDK û YNK xwiya dikin.

Pişî hilbijartînê PDK û YNK tek mezin heye.

Heta kîliyên dawî ku wê rojnameya me bihata çapkirin ji netîcîyên hilbijartînê nehabîn.

Li gor nûçeyen ji Kurdistanâ Başûr gîhîstine me, li herêma hilbijartînê munâqeşe di navbera PDK û YNK de çêbû. Her dû teref ji navê hîlebaziyê li hev dikin û gazinan ji hev dikin. Pêşmergeyên YNK ê dibêjin Hinek alîgirê PDK ê du car rayen xwe bi kar anîne.

Rûpel 15

ROJEVA WELÊT

Xelata Ataturk tijî xwîn e

Hefteya buhuri, dema Mandela xelata Ataturk bi zimanekî nerm û nazik red kir, hingê ji serokwezîre Tirkîye bigirin heta sernîvîskarêñ rojnameyên holdinga û hemû rewşenbirêñ sexte xwe negirtin; hêrs bûn, qehîrin, çavêñ wan ji hêrsê sor bûn û ji xezeba dilê wan agir ji devêñ wan bariya.

Rûpel 15

REWS

Abdullah Keskin



Her hejmareke nuh

Mirov, bi livbazî (fiil, eylem) û hereketen xwe bellî dibin. Rê ji hev vediqetin. Tixûb û sînor xwe ji berê bêhtir kifş dikan.

Riya me weke pêşîyan gotiye, zirav û dirêj e. Em dimeşin. Em xwe weke kaşîfîn berê dibînin. Bi her hejmare em başî û kîmasiyêñ xwe dibînin. Her nîvîs, her sernav, her rûpel û her hejmare ji me re çavdarra heyecaneke nuh e. Her hejmare tiştîn nuh bi xwe re tîne.

Herkesê ku di vê riyê de gavek avêtibe û bavêje em ji xwe re hevalbend dibînin. Xebata wan weke xebata xwe dihesibînin. Xwedîderketina vê rastiyê divê heqîqetan ji bi mirov ne de jîbir kirin. Heta niha rojnameyeke ku em ji xwe re weke nimûmeyekê bibînin nebû. Rast e, bingeha rojnamegêriya kurdi berî bi sed salî hatîye avêtin. Lî hêjî insanê me ji wan xebatan bêxeber in û negihîstine wan. Bi her

name (mektub), nîvîs û hejmarek nuh em kîfxweş dibin. Ji ber ku gellek tiştîn nuh derdixe holê.

Têkiliyên me bi xwendevanan re zêde dibin. Ji Pakistanê heta bi Qamîşlo, ji Parisê, Bonnê, Libnanê û ji her deverî girîngir ji her aliyeñ welêt nîvîs ji me re tîn.

Xwendevanen me divê zanibin her nîvîsa ku dişînin em li ser disekekin. Klasorêñ me ji nîvîsîn xwendevanan hatîne dagirtin. Ji bo nîvîsandina kurdi bi pêşve here û be-

Riya me weke pêşîyan gotiye, zirav û dirêj e. Em dimeşin. Em xwe weke kaşîfîn berê dibînin. Bi her hejmare em başî û kîmasiyêñ xwe dibînin. Her nîvîs, her sernav, her rûpel û her hejmare ji me re çavdarra heyecaneke nuh e. Her hejmare tiştîn nuh bi xwe re tîne.

la bibe heta ji destê me tê em cih didine nîvîsîn xwendevanan. Ji bo nîvîsîn ji me re tîn em tev biweşînin rojnameyeke ne 16 rûpel, 160 rûpel lazim e. Em nîvîsîn ku ne hatîne weşandin di arşîvî de dihelin. Gel-

lek caran ji bo nîvîsîn xwendevanan derkevin em nîvîsîn xwe û nîvîskarêñ xwe dernaxin.

Naveroka Welat roj bi roj geşir dibe. Büyereke Şîrîx, civîneke li Libnan, nîxandina kitêbekê li Fransa ku li ser Kurdan hatîye weşandin di hejmarekê de hûn dikarin bibînin.

Fonksiyana rojnameyêñ hefteyî ji yêñ rojane cihê ne. Rojnameyeke xwerû bi kurdi ji her alî ve ji rojnameyêñ din cihê ye. Ji ber ku heta niha rojnameyêñ kurdi tunebûn û hêjî nînîn. Bi baweriya me rojnameyeke kurdi divê ji aliye kulturê ve xwirt be. Xeber hineki kêm ji bin em ji û li gorî ragihanen me xwendevanen me ji ewqasî pêwîst nabînin.

Em ji xwendevanen xwe rica dikan. Nîvîsîn xwe bi daktîlo bişînin û ji rûpelekî zêdetir nekin. Ev rica me ji nîvîskarêñ me ye ji. Nîvîsîn xwe kurt (kin) bigirin. Divê nîvîsa herî dirêj ji rûpelekî du rûpelan zêdetir nebe.

Di her hejmare de em mecbur dimînin, nîvîsan kurt dikan. Di vê hejmare de ji ji nîvîsin me geleki kurt kirin. Dilbixwîn, M. Ali Tüysüz... divê li qusura me nenêrin. Em bawer dikan, ji naveroka xwe tiştek winda nekirin.

NAMEYÊN XWENDEVANAN

NAMEYÊN XWENDEVANAN

NAMEYÊN XWENDEVANAN

Ka mumîntiya hevalê te?

Ew wer mumin e (!) wer birayê te ye (!) kurê te, bavê te, insanê te dikue û herdem bombe li ser dibarîne. Ka birê te hişt tu di meha rojiyê de fitara xwe bi dilê rehet vekî? Ka hişt tu herî iîbadeta terawiya xwe? Ka hişt tu herî limêja idê? Ka bibîne birê te ê mumîn (!) li ser riya camiyê çend insanê te yêñ 70-80 salî kustîn? Çawa ku hêjî dikujin. İnsanê te ji malen wan derdixînin dibin bi saxî çermê wan digurê û dikujin li holê (li berçavan). Bi mekînên zirxa, panzer û otometîkan li ser te û gelén te girêdidin te (me). Keç û zarok, pîr û kalen bê guneh û bê xeta dikujin û li erde dihêlin. Bi ser de nahêtu herî cenazê xwe bînî û wecîbîn wanen dinî bîmî cih. Ka, mumîntî û bîrafî ev e! Biratiya ku ew divîn ev e. Gava li kara wan be em birê hev in, lê gava ku li kara wan nebe em terorist in, em Ermenî ne û Yahudî ne (!) weke xoce û mucâhidîn wan ji ji me re diben, "ew (em Kurd) ne insan in,

ew Kurd in. Ew Ermenî ne, Yahudî ne û bê sinnet in (vî behsa sinetiye ezê wekî din ji we re binivîsinim) Bi Ayetû Hedîş ka sinetî ci ye, ji ku hatîye. Ev ji ya bavê me ya kalê me ye. Ka wan ev sinet ji ku anîne malê kê difroşin kêt!..

Ê lawo, xocê hişgeni (!) ê ka heta ku em Kurd kole û xulamê te bûn, te digot (mumîn ve musliman kardeşlerim) birê min ên mumîn. Lî, wexta ku me got êdî bes e, em ne kole û xulam in, em insan in. Hege em ji bi însanî bîjîn. Weke însanen dinê ji yana serbixwe û azad bîjîn. Ka çima? Em dibin Ermenî..

Ka xoce, mele, hecî, sêx, efendi ka baş bînîhêre em kî ne? Em Gutî ne, Mîtanî û Kasit in em Med in, em Noym, Muşki, Araratî, Subari, Khalîne, em Nuh in, em Kawa ê hesinker in, em Suleymanî û Yunis in, em Zerdeş in, em İbrahimî Xelî in, em Muhemmed û Elî ne, em şahê Neqîbî û Ebdilkadîr Geylani ne, em Şêx Mehmedî Berzencî, em Qadî Muhammed in em mele Mistefa ne, em Şêx Seidî kal in, em Seyît Riza ne, Egit in, Kawa ê hemdem in, Ze-

kiye û Rewsen in. Em ev in.
Sefeqa Azadiyê
Hey! Guhdar bin.
Em serfirazî û wekhevî dixwazin.
Bi zimanê xwe peyvîn û nîvîsin
û bila serê me ji bilind be.
Ala me li ba be
li Zaxros û Hereqol
Munzir û xelatan
Sîpan û Cilo û Agirî
Cûdi û Gabbaran
Agir lê dibarin
Îro Afat û şewitandin
Bi zaro û zêç
Neyar me dîsa dikujin
Ferman çêkirine ferman
Ka? tuneye derman!
Hah hah ha!..
Ew nîzanîn, ew ehmeq in
Bi kuşin em nayêñ rawestandin
Em naqedin
Yekî ji me bîkujin
Hezar ji me çedîbin hezar!
Em namirin
Bi şehîdîn welat dikim

şefeqa azadiyê,
way e avêt
Ka bibînin!
Emê ci bikin?
Em qeydan bişetin
Dîrokê biçirînin
Kurdistanê bi serfirazî deynin
Bi ser xwîna şehîdan
Dara azadiyê çînkin
Xweşkin birano! xweşkin
Xweşkin xwişkno! xweşkin
Ev dîlan e!
Dîlana Kurda ne
Heyy! Heval wa li çiyan
Dozê dajon
Ka em li ku ne?
Dest bidin hev
Wek xwişk û biran
Hêz bidin xwe
Bêjin An Azañ An Neman
Şer bikin ji bo azadiya gelan
Xelaskin xwe ji bin destan
Ax! Bîjî biratiya gelan.

Mele Amedi û Baran Izmir

KARTA ABONETİYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ... pê ve min bikin aboneyê Rojnameya WELAT

Nav

Paşnav

Navnîşan

Bedelê abonetiyê razînin:

Li Tirkîyê : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu
Şub. Hesap No: 379809

Li Derve : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu
Şub. Döviz tevdîat hesap No: 3113617

Aboneyen hêja,

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin. Navnîşana

WELAT Nuruosmaniye Cad. Atay Apt.

No:5 Kat:1 D.4

Cağaloğlu / İSTANBUL

Tel: 511 57 60-511 66 02 Fax: 511 51 57

Mercen abonetiyê:

Li hundir

Li derive

6 meh

60.000

30 DM

12 meh

120.000

60 DM

Bêbextî ne karê camêran e

Bersiva Wehab Serin ku di heqê min de di rojnama we de tiştê bê esil û binyat nîvîsîne hezmar 11 2-8 Gulan 1992 rûpelê 3. de.

Di 20.7.962 an de li Batmanê ez bi karkerî ketme Şirketa Petrolê û di 4.4.963 de min ji şirketê avetiñ ji ber ku ez Kurdeki bi nav û rûmet bûm.

Di 19.1.1968 an de ez û hevalan li ser damezrandina Partiya Demokrata Kurdistanê Tirkîyê hatine girtin û em salek li bendexana Antalya de man û me hemû mafêñ gelê Kurd bi serfirazî parastin.

13.11.1982 dîsa ez û 10 hevalan li Kurtalan hatine girtin û em birine Batmanê, li ber çavê wan hevalan min gellek lêdan û ezab dît heta ku ez ji dilive çûm ew heval ji hemû saz in.

Di 19.12.1984 an de dîsa li Kurtalan ez û 11 kes hatine girtin û me rojên pîr nexwes derbas kirin, di sala 1985 de ji ber ku ez endamê PDK bûm mehkema Diyarbekrê şeq meh ceza da min û min. hepsa xwe li bendexana Kurtalan derbas kir.

Di 19.12.1985 de dîsa min girtin û min birine Diyarbekrê 21.1.1986 de pişî lêdan û ezab pîr mezin ez berdam.

Heta fro di van girtinê xwe de pişî ewqas lêdan û ezab kesek li ser ifadên min ne hatiye girtin û ifada kesî ne hatiye girtin. Ku digel mîta Tirkân, dan û standinê min hebûna min ewqas lêdan û ezab û hepis nedixwar.

Careke din di heqê min de tiştê bê esil û fesil û bê delîl nenivîsin. Lewra bêbextî ne karê camêran û insanen pak e û vê bersîva min di rojnama xwe de belavkin. Serfirazî û pêşveçûn daxwaza min e, gellek silav li ser we bin.

Derwêş Sado

Berpirsiyariya WELAT a Ewrûpa vebû

Navnîşan :

Postfach : 1531, 5300 Bonn 1, GERMANY

Tel : 228 - 630990

Fax : 228 - 630715

Cînâvkênd kurdî

Zimanê kurdi û tirkî gellek ji hevdu dûr in. Kurdi di koma (grûba) Hind-Ewrûpî û tirkî ji di koma Ural-Altay de ye. Ji ber vê yekê herdu ziman ji hevdu gellek dûr in. Lî, zimanê kurdi gellek nezî Elmanî, Ingîlîzî, fransız, swêdî û hwd. e. Di qanûn û prensibên koma Hind-Ewrûpî de gellek tiştîn hevbes (muşterek) hene. Ji van qanûn û prensibên hevbes yet jî xwendevanen û nîvîsîndîn cînavkan (şâhis zamirîyan) e.

Mirov nikare bê cînavk hevokan (cumlan) çêbiye. Wek nimûne, ne rast e, ku mirov binivîsîne; "îro têm" an ji "îşev têm." Divê mirov binivîsîne: "ez îro têm." "Ew îşev têm." Heger mirov bê cînavk binivîsîne maneya hevokê naye fêm kirin. Ji ber ku di hevoka "îşev têm" de, dikare sê cînavkên cuda hebin: "Em îşev têm". "Hûn îşev têm." û "Ew îşev têm."

Di warê cînavk de taybetiye (xisûsiyeteke) koma zimanê Hind-Ewrûpî ji ev e, ku cînavk tu carf bi bêjeyen (kelîmeyen) din re nayêne nîvîsîndin. Nimûne, mirov nikare binivîsîne; Eznan dixwim, "Ez jitere dibêjim" û hwd. Divê wiha bê nîvîsîndin: "Ez nan dixwim." "Ez ji te re dibêjim."

Di nav koma zimanê Hind-Ewrûpî de wek her zimanî taybetiye cînavkên kurdi ji hene. Ji van taybetiyan yek ji hebûna du komên cînavkên kurdi ne. Yanî di zimanen din de komek (grûbek) cînavk heye, lî di kurdi de du kom cînavk he:

Kom-1

Min

Te

Wî / wê**

Me

We

Wan

Kom-2

Ez

Tu

Ew

Em

Hûn

Ew*

* "Ew" hem ji bo yekhejmar sisêyan û hem ji bo pirrhejmara sisêyan tê gotin û bikaranîn. Lî, di lêkera (fîlla) hevokê de xwiya dike, ku kijan ji bo yê yekhejmar û kijan ji, ji bo yê pirrhejmara.

** "Wî" ji bo kes û navên û "Wê" ji bo kes û navên tiştîn mî tê bikaranîn. Wek: "Wî got" yanî zilam got. "Wê got" yanî jinikê got.

FERHENGOK

Binefş: (menekşe)

Bergeh: aso (ufuk)

Diyarî: hediye (armağan)

Hendef: zinar, kortal (uçurum)

Hevbes: hevpar, şirîk, hîsedar (ortak)

Raperîn: Pêngav (atılım)

Xelat: Şabaş (ödül)

Xizan: Feqîr (yoksul)

Xizanî: Feqîr

Xopan: xerabe, wêran (harabe)

Mebûsê Mêrdînê Mehmet Sincar dipirse

'Ev qetlîam wê kengî bisekinin?'

● Mehmet Sincar dipirse: "Di dewleteke demokratik de li gora kijan qanûnî insan bê mehkeme bi mirinê tê ceza kiran? Li gora we ev qetlîam ne terora dewletê ye? Ew kesen ku hem gerillayan hem ji mirovên destvala bê mahkeme qetil dikan dê derkevin mahkemê an na?"

Mebûsê serbixwe yê Mêrdînê Mehmet Sincar, di derheqê yetkiliyên de dibêje: "Roja 20'ê Nisanê 7 kesen bi maske pêşîya minfusa Xirbê Xalit (gundê Midyadê) digirin, di-sekinin û 4 rîwînan dikujin (Mehmet Candan-45, Haci Bodur-22, Hamza Bulut-8, Yusuf Bodur-1), 7 kesen ji birîndar dikan (Musa Candan, Hikmiye Candan, Yasin Bodur, Katibe Bulut, Emin Candan, Sêvî Bodur, Rîdvan Candan.) Li gora ifadeya van rîwînen birîndar, yek ji wan rîbirîn bi maske parêzker (korucu) ê Xirbê Xalit (zavê Suleyman Bulut) e. "Pişti vê izahatê van pirsan dike:" Ci-ma dewlet van xwînxwaran xwedî dike û hê ji maaş dide wan? Ev mirovkujênu ku ji te-refê birîndar ve hatine naskirin û tesbîkirin gelo wêneyên cezakirin?"

Mehmet Sincar di daxwaznameya duymen de li ser qetlîama Sitê (Çalpinar, gundê Midyadê) disekine. Di vê he-diseyê de dîsa eyîn roj pêşîya

minfusû kamyonetek tê girtin, rîwîn tê peyakirin û ji aliye 30 kesen bi unîforme ve 8 mirovên destvala tê qetlîkirin (Suleyman Acar-30, Mehmet Akan-75, A.Kadir Can-25, Sabrî Acar-42, Hasan Akay-40, Mehmet Ağırman-27, İsmet Acar-45, M.Emin Acar-47), 10 mirov ji birîndar dibin (Reşit Acar, Yusuf Acar, Salih Acar, Erdal Acar, Ahmet Acar, İbrahim Akan, Semra Akan-3, Halil Akan, Yılmaz Acar, Ziver Acar-10).

Kesen vê qetlîamê ji kiran dîsa ji hêla birîndar ve tê naskirin (yek ji wan ser-parêzker (korucubaşı)ê gundê Kutlubey, Cengiz Kaçmaz, yek ji parêzkerê eyîn gundî, Ethem...) ji xeyîn wan, kumandare qereqola eyîn gundî ji hatiye tesbît kirin ku ev herdu kes di malen xwe de û destvala hatine kuştin, tu eleqeya wan û gerillayan bi hev re tune ye."

Pişti vê qetlîamê, karbîdesten (yetkiliyên) dewletê di TRT ê de gotin ev mirov ji te-ref gerillayen PKK ve hatine kuştin. Mehmet Sincar dûre van pirsan tîne ziman. "Madem ev qatil ji aliye rîwînan ve hatine dîtin û naskirin, ci-ma nayîn mahkeme kiran? Ci-ma dewlet bi ser wan ve naçe û vê qetlîamê dixe ser gerî-

layen PKK ê? Madem dewlet dibêje PKK ê ev qetlîam kiriye, cîma li halê xwediyê van mirî û birîndaran napirse?

Daxwaznameya din ji di derheqê qetlîama Nisêbînê de bû. "Roja 6'ê Gulânê hêzên dewletê Mehmet Veysî Orhan-24, di mala wî de li ber çavê pîreka wî dikujin û pîreka wî dixin bin çav. Dîsa di eyîn saetî de tê Tevfik Kaya ji mala wî derdixin derve û dikujin, pîreka wî jî dixin bin çav. Du-sê saet di ser van bûyeran re derbas dibe û hêzên dewletê digirin ser maleke din û 6 mirovên din ku dibêjin gerilla ne dikujin. Lî belê çawa ku M.Veysi Orhan û Tevfik Kaya di nav gerillayan de hatibin kuştin, cenazen wan ji tînin cem yê gerillayan. Di ajansên TRT ê û rojnameyan de dibêjin ku 8 gerilla bi hev re di xêniyek de hatine kuştin." Mebûsê Mêrdînê Mehmet Sincar, bi pirsên jêrîn daxwaznameya xwe diqedîne: "Baş hatiye tesbît kirin ku ev herdu kes di malen xwe de û destvala hatine kuştin, tu eleqeya wan û gerillayan bi hev re tune ye."

Di dewleteke demokratik de li gora kijan qanûnî insan bê mehkeme bi mirinê tê ceza kiran? Li gora we ev qetlîam ne terora dewletê ye? Ew kesen ku hem gerillayan hem ji mirovên destvala bê mahkeme qetil dikan dê derkevin mahkemê an na?

Şahidê bûyeren Newrozê rojnamevanê Swêd nirxandina xwe kir:

'Ji Tirkîyê teror û işkence, ji gel berxwedan

● Rojnameya çep Swêdî Proleteran di hejmara xweya 7-13 Gulân ê de rûpelek da ser bûyeren Newrozê ku li Cizîra Botan bû. Nivîs bi navê rojnamevanê Swêdî Hönkel Haso hate weşandin. Hönkel mîna rojnamevanekî di dema Newrozê de li Cizîre bû.

Dolivgeriya Tirkîyê ji bo ku ji cihanê re bêje: "Me PKK perçî-qand", li Kurdistanê, gund û bajarên biçük bombebaran kir. Berê çekên xwe dan mirovên jar û welatperwer.

Newroz cejna Kurdan e. Çawa ku berî niha bi 2 hezar salan rolek ji bo rizgariyê leyistibû iro ji wê rolê dileyize. Lewmaye ku gelê Kurd, di vê Newrozê de rabû ser xwe û piştgirîya partiya xwe PKK ê kir, ji bo xelasbûnê, rizgarbûnê... Her wiha di her Newrozê de ew, dilanê dikşîne, stiranan dibêje û xwarînên xweş çedike, rengîn ala xwe derdixîne meydanan.

Di Newroza 1982 an de li zindana Amedê Mazlum Doğan agirek vêxistibû ku ev agir iro li seranserê Kurdistan belav bûye. Newroza sala 1985 an mizgîniyek da gelê Kurd ku bûye bi réxistineke ramyarî, ku di wê demê de ERNK ava bû. Di

Newroza 1992 de ji serhildan destpêkirin û bi sedhezaran kes di bin ala ERNK de gav bi gav ber bi xelasbûnê ve diçin. Cizîr ji awira welatparêziyê cihekî pirr gîring e. Li wir kontrol bi roj di dest dewletê de ye, lê êvaran dewlet PKK ye. Li gelek deveren Kurdistanê troj wisa ye.

Pirozkirina Newrozê

Berî Newrozê dora Cizîre tev panzer û bi çekên giran pêçabûn. Berê çekê xwe dabûne navenda bajêr. Xelkê berî Newrozê bi rojekê dest bi pirozkirina Newrozê kiribû û ev, heyâ nîvê sevî berdewam kir.

Dora rojê, panzeren dewletê li navenda bajêr rawestiya bûn. Hundîrê bajêr tîji leşker û kontra, tûmîn taybetî bûbûn.

Nêzî 20 hezar kes li navenda bajêr û der dora bajêr gihabûne hevûdinê. Di destê xelkê de ala rengîn, wêneyên Mazlum Doğan û Abdullah Öcalan hebûn.

Jin tev bi rengê ala xwe cil û bergen xwe li xwe kiribûn. Û dewlet bi awayekî hov kete nav gel û nêzî 15 deqîqe xelk, ber û bombebaran kir. Rojnamevanekî li ber çavan hate kuştin.

Polîsên Tirk, gelek mirov gitin, di nav wan de Swêdiyek ji hebû. Filmên wî tev jê standin, mekîna wî şikandin û 3 hezar kron jê bi zorê standin. Yê Swêdî di dema girtina xwe de, gelek zarok dîtin ku hatibûn işkencekirin.

Li erdê gelek xwîn xwiyanî dîkir û bi sedan kesen bê sîc hatin işkencekirin. Ev teroreke ve-kirî bû.

Roja Newrozê li ber çavén min 29 kes hatin kuştin. Tişten xiraptir li Şirnexê bûbûn, lê tu rojnamevan li wir tunebûn.

Li hember van neheqîyan, Kurd bêçar in. Tu rê ji wan re tune ku xwe rizgar bikin. Her rîyekê maye: Ew ji şerî çekdarî ye. Gelê Kurd di bin pêşengîya PKK ê de niha civînên mezîn çedîkin da ku parlementoya xwe ya Neteweyî çekin. Ev gaveke pirr mezîn e...

KONEVANIYA NUH

Nizamettin Toğuc (Parlementerê Batmanê)



Dewlet xwe dixapîne

Wextê pisîk dilê xwe li çêlikêne xwe xira bike ku wan bixwe, pêşî wan di nav toz û gemarê de dihîlikîne dixe şîklî müşkan hêj dixwe. Li me û dewleta romê ji vê yekê dest daye. Carek dewletê biryar daye ku gelê Kurd serbîr bike û xwîna wî firr ke! Ji bo vê ji, li ser me senaryoyen erzan çedîke û me dixe cilê "teriştan" û dikuje.

Di karvanî ya dewletê de ev rist ne iro dest pê kiriye; ji serhil-dana Şêx Seîd bigirin heta qirkirina Dêrsimê û heta Newroza îsal bi yek rengî provaqasyon hatine çêkirin û gelê me hatiye qetikirin û sîrgunkirin.

Pişti şahî û şadîmaniya Newrozê, hêzên ewlekarî yêne dewletê, li gund û bajarê Kurdistanê bi sedan kesen me binçav kirin, dane işkencê û bi saxîti şewitandin! Di vê bê xwedaîtiyê de dewlet li meznahî, biçûkahî û jinahî nanêre. Şevki Akîncı (16 salî) şewitandin, wêneyê wî di rojnaman de derketin we dît ku ci bi serê wî ve anî bûn. Mehmet Yilmaz (76 salî) li Batmanê xistin bin çav. Di bin işkencê de xwîn bi ser mejîyê wî ve rîjiya. Ji zarokên wî re gotin; "bavê we tera bû û wiha lê hat!" Mehmet Yilmaz pişti çend rojan giştî heqîya xwe. (Xwedê rehma xwe lê ke)

Dîsa li Batmanê Şükran kirin binçav bi işkencê mil û pişta wê sel kirin. Şükran li Enquerê raporê işkencebûyin stend.

Vê pêlê hikümet behsa pêkanîna zagonê demokratik dike (!) ji bo sazkirina tiştîn demokratik, aşkîrin û biratiya gelan em her tim alîkar in. Lî belê em zanin ku hikümet di vê yekê de ne rast û dirust e.


Berî vê ji em zanin ku hikmê hikümetê li Kurdistanê qet tune-ye. Di duserîtiya nava Kurdistanê de, serîye ku di destê hikümetê de ye ne li ber tu tiştîkî ye!

Serokwezîrê dewletê birêz Süleyman Demirel, di hemû gotin û daxwîyanîyên xwe de behsa realîta Kurdî dike û dibêje, kesen me yê "Kürt kökenli" (çavê wan bar nade bêjin Kurd" ne di çin (qad) a duyemîn de ne. Belê rast e, Kurd ne di çîna duyemîn de ne. Ji ber ku Komara Tirkîyê ji rejîma Qastê ji xirabtir e! Kes nikare bêje Kurd di çîna duyemîn, dehyemîn û pazdeh û şazdeyemîn de ne ji.

İro TRT bi şazdeh zimanê biyanî weşen dike. Tevî vî, wextê behsa "Kürt kanalî" hate holê; pêşî birêz Demirel, dûv re ji nivîskarê rojnameyên nîjadperest pirtikan ji xwe birrîn. Ev rewş tê vê wateyê (maneyê-yayın) ku Kurd ne di çîna şazdeyemîn de ne ji li ba wan.

Em van bûyer û van gotinan ne ji bo hêviya "şefqet" la dewletê tiştîn dev. Berî her tiştî em zanin ku "bextê Romê tune ye". Van tiştan, ji bo gelê me jê ders bigire- bi taybetî ji bo kesen me yê qafê wan ji kîsê dewletê ye- û ji bo pê hisandina kom û komikêne mafîn: mirovan diparêzin em tînin holê.

Heyeta parlamenterên Finlandî li Kurdistanê



Di 16'ê Gulana 1992 an de, 2 parlamenterên Finlandî hatin Tirkîyê. Ev parlamenterên han, dixwestin ku li Kurdistanê lîgerînekî bikin. Hikümet gellek astengan der-xist pêşîya van mebûsan, ji bo ku neçin li Kurdistanê negeerin û rastianen nebînin. Lî dîsa

jî tevî van astengîyan, parlamenterên Finlandî, dev ji gera xwe bernedan. Ji Amedê dest bi gera xwe kirin û bi niwenêren (temsilciyên) kome-la mafîn mirovan ve, li gellek navçeyen Amedê gerîyan. Ev parlamenterên han, hîna ji gera xwe ya li Kurdistanê didomin. Herwiha grubek parlamenterên Avusturyayê ji xwestin ku bêñ li Kurdistanê bigerin. Lî hêzên dewletê daxwazîya wan a ewlehî (gûvenlik) bi cih neanîn. Çavén van mebûsan tîrstandin û dîsa şûnde vegerandin.

Hêzên dewletê naxwazîn ku kesen biyanî zilm, zordestî û qetlîamîn wan ên li Kurdistanê bibînin. Ji bo ku gelên dînyayê, dengê gelê Kurd nebihîze, ci ji destê wan tê dîkin.

Mafêni mirovan û demokrasiya sexte ji reşikên Los Angelesê bipirsin

Şoreş Dicle

"Bimire nîjadperestiya rîjîma Amerîka! Biji aştî! Biji berxwedan û yekîtiya reşikan!.. Reşikên Amerîka wiha qîriyan û bi dar û ber û bastonan di kolan û taxêni Los Angelesê de serî hildan û ji tevayî dînyayê re xwiyakirin ku çerçemandina li hemberê zora nîjadperestan ne çareya rizgarî û serifirazîye.

Bi hezaran reşikên ku di jiyanke mirî de dijin, piş dane ber hev û dadmendî û daghehîn Amerîka yên ku kesen tewanbar bê sûc derdixinin û yên bê sûc ji tewanbar derdixin û bîryarêne mafdar di derbarê wan de distînin, protesto kîrin. Şofêrî ku çar polîsan Amerîkî yên çermisipî, beriya salekê dabûn bin lêdanê, li dawiyê ji dagheha Amerîkî ew polîs berat derxistin û gotin li gorâ zagona Amerîkî maf di dest polîsan de ye, lê belê reşikên Los Angelesê ew bi tenê bernedan, piştgiriya wî kirin û dest bi şoreşa ku mirov dikare nav lêbike "Şoreşa Reşikan" kîrin. Ji ber ku jiyanwan bi xwe ne tu jiyan e, jiyanke wisa ye ku çerm siyîek kîliyeke tenê ji tê de jiyan nabe.

Gelo sedem ci ye ku reşik ewqasî ji mafêni mirovahiyê bêpar in? Çima çermisipî di dema ku dilê wan dixwaze de reşikan di din bin lêdanê û wan mîna koleyan ji xwe re dixebeitin? Ev e demokrasi û wekheviya ku Amerîka bangeşıya wê dike? Bêgûman ev hemû sextekarî û kedhwariya rîjîma Amerîka didin ber çavan. Ji derive ve, mirov dibêje qey Amerîka buhuşa (ceneta) cihanî ye, gulîstana azadî û wekheviyê ye, lê dema ku mirov derbasî hundir dibe dibîne ku çeper û çal û dojeha (cehnema) mirinî ye. Rîjîma ku kapitalizm dide mesandin ev e. Kesê ku kapital di dest wî de hebe ew di kîrîn û firotina mirovan de serbest e, weke

dema koletiyê. Lî belê koletiya kapitalizmê koletiyeke modern e, mirovan ji xwe re dike navgînên reklam û propagendeyê. Rastî ev e, niha bi sedan jînê ku xwe bi hezar rengî dîkin hene, çima? Ji bo ku reklama kargeh an ji fabrîkeya kapitalistekî bikin. Anglo, heya ku wê jînê derbasî bazarê bikin bi dehan bazirgan li ser têne hev, ji xwe re bihizirin, kapitalizma ku di mîjîyê hinekan de mîna xeyalekî ye ev e..!

Ji bo ci Los Angeles?

Ü... li dawiyê serhildana reşikên Amerîkî dest pê kir. Bi wê serhildanê re reşikan îspat kîrin ku Sîstema Cîhanî ya Nuh, a ku Amerîka dixwaze pişti hilweşandina Sosyalîzma Reel bide meşandin, pûc û ne xwedî armancê insanî ne. Lî li vir hinde pirs di mîjîyê mirov de dilivînîn, se demen serhildana wan zencyan ci bû? Gelo, siyasi bû an ji civakî bû? Ci di hundîre Amerîka de çedibe û ci ji çenabê?

Weke tê zanîn Amerîka dewleta yekemîn e ku di wezareta wê ya derive de Komela Mafêni Mirovan tê damezirandin, çima? Ji bo ku nexweşiyen xwe yên di civakê de biniximîne û ji dînyayê re bide îspat kîrin (dînyayê bixapîne) ku yekemîn dewlet e yê mafêni mirovan diparêze. Lî karvanî ji sedî sed bervajî vê diyar dike, li Amerîka heya dawiyê mafêni mirovan di bin piyan de têye perçiqandin.

Van bûyeren dawiyê eşkere kîrin ku Amerîka di astengeke siyasi, civakî û aborî de difetise.

Bi kurtî naveroka çîroka Los Angelesê ev e:

Di Gulân 1991'ê de çar polîsan Amerîkî yên çermisipî şoferekî reşik ji bo ku hinekî erebeya xwe bi lez ajotîye didine bin lêdanê û parsîyen wî bi daran dişkînîn, hinek dibêjin lêdanê tesîreke negatîv li mîjîyê wî ji kiriye. Di zagona Amerîkî de ji bilezajotina erebayan ne işkencekirine-

"Bimire
nîjadperestiyc
rîjîma
Amerîkî
Biji
aştî
Biji
berxwedan
û
yekîtiya
reşikan!..
Reşikên
Amerîka
wiha
qîriyan
û bi dar
û ber
û bastonan
di kolan
û taxêni
Los Angelesê
de
serî hildan

ke wiha hovane ye, çend dolar û gefxwarineke. Lî belê, weke ku ew polîsan Amerîkî li Vietnamde yekî rast werin, wî di nava kolanê de û li pêşîya çavan didine bin daran... li dawiyê ji dagheha Amerîkî pişti salekê wan her çar polîsan bê sûc derdixe û berat dike. Ev e dadmendîya (edaleta) daristana hovan!

Encama nîjadperestiycê ci bû?

Di dema ku işkencekirina wî reşikê şofêr de, kameramanek di

wir re derbas dibe û li bûyerê rastî, dawet dibe daweta wî, 18 deqiqe ji wê temasgehê dikşîne û dide televîzyonê navçeyî. Bi milyonan kes dibînin çawa yê reşik di nava desten polîsan de ketiye hawara mirinê. Şeş (6) mîr û şes jînê hakim ku hemû sipî bûn, şofêr tewanbar derdixin û dibêjin ku polîs di vê daweyê de mafdar in... û hol dibe hola mîran, reşikên Los Angelesê piş didin ber hev, dest diavêjin dar û beran û ci tê pêşîya wan hildiwe-

şînîn, dişewitînîn û wêran dikin.

Pirs ne tenê işkencekirina reşikî ye, her roj işkenceyê wiha hene, pirs kîneke kûr e. Reşikan kîn li diji sıpiyan hilgirtine. Ji ber ku herdem neheqîyan ji dest wan dibînin.

Los Angeles bi xwe ji yek ji wan bajaran e ku reşik têde ji hemû mafêni mirovahiyê bê par in. Taxen ku têde dimînî ji yên çermisipîyan geleki cudatîn in. Geamar, nexwesi, bêkarî û hemû rengîn dizî û bêexlaqiyê lê têne dîtin, rîjîma Amerîka bi zanebûn şerekî wiha taybetî li diji reşikan dîmeşîne.

Li gora ku şenîyên bajêr dibêjin bûyerere din ji heye, gûman hene ku di dema pêş de eşkere bibe. Segekî polîsan bi zarokî reşik (14 salî) digire, polîs ji ji xwe re li ber sekiniye û lê temasgehê wiha re tê... (Kaset bi dizî hatîye kîşandin) Hinde grübîn reşikan dibêjin emê di dema pêş de vê kasêtê derxine ronahiyê.

Los Angeles ne tenê bûyerere û hew, bi dehan bûyeren bi vî rengî û hêjî hovtir hene.

Eger rewş wiha biçe, ne dûr e ku kapitalizma Amerîka têkeve astengeke kûr ku nikaribe xwe jê rizgar bike.

Demokrasî û mafêni mirovan li Amerîka û li gora bir û baweriyêne rîjîma emperialist bi vî şeweyî ye... Hün rastiya van tiştan ji reşikên Los Angelesê bipirsin. Wê ew bersiva we baş bidin, ji ber ku bi salan in ew di nava vê nemirovahiyê de jiyan dibin.

GOTİN

Yaşar Kaya



Medya Kurdî

Gelek heval û ji gelê me dipirsin ev rojname û kovarîn ku bi kurdi derdi kevin ci qas difroşin. Heqê wan heye, gereke em gelê xwe û heval û hogirê xwe bê bersîv nehîlin. Nêzîkî 2 salan e "Yeni Ülke" Derdi keve, heya niha 22 caran hatiye berhev kîrin û gelek caran ji hevalen ku rojnameye derdixin çûne daghehan. Lî xwedê kîmasiya gelê me nede, roj bi roj firotina wê pêş ve diçe. Ev heftiye çûyi nêzîkî 40.000 (çil hezar) li hundir, 15.000 (panzde hezar) ji li Ewrûpa hate firotin.

Ji kijan alî ve dinêrin binêrin "Welat" heftê nêzîkî 15.000 (pazdeh hezar) tê firotin û roj bi roj zêde dibe. Tewlo nêzîkî 7.000 (heft hezar) difroş, eva bû 75.000


hezar. Özgür Halk, Deng, Newroz, Newroz Ateşî, Medya Güneşi. Govend, van gişka bidî ser hev dibe 100.000 (sed hezar). Ji bo rojnameyekî rojane ev medya rî dide pêşîya me, em li ser difikirin û dibêjin ji iro pê de nêzîkî sed hezar xwendevanen me hene. Lî belê ev ne bese.

Ronesansa Çanda kurdî anegora min di sala 1990 an de dest pê kir. Ji wê rojê heya iro gelek kovar, rojname û pirtük hâtine çapkiranê. Xwendin mîna çemekî ku hêdî hêdî, sivik sivik ji çavkaniya xwe derdi keve û çiqas diçe qalind dibe, gurr dibe, dikiş diçe ber devê gol an ji behrekî. Li ser Kurdan gelek pirtük derdi kevin, hinek gazinê xwe diken, hinek weşanxane pirtükên hevalan çap diken û difroşin, qet haya nivîskar ji jê nabe û tu tiştekî nastîn, heya ku pê dihisin, dinêrin ku pirtükên wan "korsan" hatine çapkiranê. Ev şermeke giran e. Ev yek. Ya duyemîn hinek weşanxane li İstenbolê bi nivîskar re dipeyivin, pirtükâ wî jê distînin, çap diken, paşê hegê kedâ wî nadînê. Navê vî şixulî

ci ye? Ez gelek meraq dikim.

Xwedêgiravî evana şoreşer û demokrat in, heqê kesî naxwin. Di van salen çûyi de ji bo keda millan û keda seriyan têkoşin kirine. Qewlê xalê Evdo ve... Tewlololo.

Jiyan van rojan ji bo me gellek girîng e, her gav avêtina me dîroka me ye. Em ne li paş in, ne ji li pêş. Roj bi roj, meh bi meh kovar û rojnameyên Kurdan derdi kevin. Gereke em xebatekî rast bimeşînîn, ji bo sibê dîrok bi pêşîra me negire. Em bi serê bilind û bi dilekî xweş bigerin. Medya Kurdî hêdî hêdî çê dibe, em qedr û qîmet bizanibin, ev ne tiştekî hêsan e, ji destê ki tê bila jiyança çand û edebiyata kurdî dewlemend bike. Li Kurdistana Bakûr 20-25 mîyon Kurd hene, em gavên zû û fireh neavêjin em nikarin bigîhejin tu derê. Ji çîrokên zarakan heya pirtükên dîrokê, ci heye ji me re lazim e. Serokê Hindistanê Nehrûyê nemir dibêje: "Agirê yek mûmekê bi serê xwe dikare di dinê de çiqas tarî hebîn birçirine.



Mandela û nivîskarêne Tirk

Huseyîn Deniz

Nelson Mandela, Serokê Kongreya Efrîka a Neteweyî ye. Wek hemû miletê bindest, em Kurd jî navê Mandela û têkoşîna wî zanin. Lî ev çend roj in, ji ber ku navê Mandela ji rojnameyên Tirkan nakeve, êdî herkes zane bê Mandela kî ye.

Mandela fro bêreqa (ala) azadiyê ye. 30 sal ji emrê wî di riya azadiyê de di girtixa-nan de derbas bûye. Temamê jîna Mandela li hember kev-neperestiyê, xwînmijiyê û mêtîngeryê ye. Mandela yê reşik di vê riye de gelek eziyet, tade û qiriqtalî dîtiye; lê tevde jî, ew ji têkoşîna wî ya li ser heqiyê venegerandiye. Ji ber vê yekê û riya wî ya rast, fro Mandela li temamê dînyayê, li cem hemû gelen aştîxwaz, mirovperwer, kese kîja ye, birêz e, bi qedr û bi qîmet e.

Ji ber ku dewleta Tirk zîlm û zorê li miletê xwe li miletê Tirk dike, gelek mirovén pêşverû û welatparêz, bê súc û bê heqî dikije û winda dike, ne demokratik e û guh nade heqîn mirovan, li cem tu dewletî rûmeta wî tune ye. Dewlet fro ji dînyayê û ji miletê aştîxwaz û li ser heqîn mirovan disekinin û bi îhlâkirina heqî mirovatiyê dêşin, ji gişan tecrîf bûye û tu dost ji xwe re nehiştiye. Ji xwe ji ber vê yekê jî Tirk dibêjin, ji xeynî Tirkan dostê Tirkan tune ye. Lî fro em dinêrin, ji ber vê hovitiya wan, dewleten Tirk jî guh nadin dewleta Tirkîye û dixwazin xwe ji. vê dewleta xwînxwar bi dûr xin.



Durûtiya rojnameyên Tirk. Pêşî qehreman bû, pişte bû terorîst.

Dewleta Tirkîye ji ber ku li dînyayê bê dost maye, dixwest ku xwe bi Mandela bide naskirin. Yanî bi navê Mandela, xwest ku li dînyayê propaganda xwe bike, bêje, gelî dewletan, gelî miletan binêrin ka dewleta me çiqas aştîxwaz e, li heqî mirovatiyê digere û qedrî miletê bindest û kesen belengaz û xelkên ku têkoşîna azadiyê didin, zane. Ji ber vê yekê jî xwest ku fsal, Xelata Atatürk a Aşîyê bide Nelson Mandela. Lî hesabê Tirkan ê malê û sûkê wek hev derneket. Mandela xelata wan qebûl nekir, li nav çavê wan

xist û go, hûn Kurdish diperçiqînin, hûn heqî mirovan nas-nakin, xelata we serê we bixwe.

Li ser qebûlnekirina Mandela, tirtirêne dewletê û partiyen paşverû û rojnamevan û nivîskarêne qorziya dîn bûn. Xwîn bi xwe ve dîtin. Tevde gotin û nivîsandin: "Ev Mandela jî kî ye? Reşikê ha kî ye ku xelata me nagre? Ev ci nankorî ye? Hîn me xelat da ye wî ew qebûl nake?" Çend nivîskarêne ku xwe li qorziyen rojnameyan veşartine jî nivîsandin, gotin: "Ji xwe Mandala aqlê xwe winda kiriye.

Heta ku dewlet ev dewlet be, heqî Kurdish nede, heqî

me çawa xelat dide terorîstan? Ma koranî bi dewletê hattîye?" Çend nivîskarêne bê edeb û bêar jî ji Mandela'yê buhuştî re gotin: "Terbiyesiz". Lî herkes zane ku ê "terbiyesiz" ew û bav û kalêwan in. Tevde bi qurbana serê Mandela bin. Neynoka ku Mandela diavêje ji van nivîskarêne paşverû, dewletperest û nijadperest çêtire.

Gotinek Tirkan heye, dibêjin, "Berê derziyê di xwe rake, paşê şûjinê di hevalê xwe rake." Nivîskarêne qorziyen rojnameyan gerek berê li xwe û li dewleta xwe û li xelata xwe ya lewîtî binerin û paşê bipeyivin. Ne xelata wan li gora navê xwe ye û heta niha dane kesen aşîfixwaz, ne dewleta wan dewletek demokratik e û li ser heqiyê ye; û ne jî ew bixwe alşigirê demokrasiyê û heqîn mirovatiyê ne. Pişti van tiştan çawa aqilê wan û çavê wan dibîne û baweriya wan heye ku Mandela'yê bi nav û deng û birêz were xelata wan lewîtî bigire. Mirovok wek Mandela wê çawa navê xwe yî paqîj bi vê xelata lewîtî bi herimanda. Li gora me û li gora kesen bîbir û ku piçekî ji dînyayê xeberdar bin; negirtina Mandela ne ecêb e. Ku Mandela ev xelat bigirta wê ecêb ba. Mandela tiştik gelekî normal kiriye, ma wê çawa xelata ku berî wî dane Generalê NATO yê, serokkomarê Almanya yê, îm-paratorê Japonya yê û xwînxwarê Tirkîye Kenan Evren bigirta, qebûl bikira? Qey Mandala aqlê xwe winda kiriye.

Çima zarokêne kurd bi zimanê xwe yê zîkmakî xebemadin û mîna zarokêne din kilaman nabêjin û nalîzin? Çi kîmasiya zarokêne kurd heye?

Gelî nivîskarêne qorziyen rojnameyên Tirkan, berî ku hûn êrîs bikin Mandela û yên wek Mandela, li xwe binêrin. Gelo çîma ji xeynî we dostê we û dewleta we yî nijadperest tune ye? Piçekî bifikirin, gelo hûn li ser riya heqiyê ne, hûn rast in? Gelo çîma kes hez ji we nake? Ma tim hûn rast in, xelk dijminê we ye? Xete ji we ne be? Ka binêrin, gelo dewleta we heqî Kurdan nasdiye? Heqî mirovan heye yan tuneye? Zilm û zor li Kurdan û kesen pêşverû heye ya tune ye?

Li hundirê welêt hûn ince karibin xwe û kesen nezan û nijadperest bixapîn. Kës ne-ma ji we bawer dike. Nivîsandinê we tu tesîrê li kesen derve nakin. Hûn ji xwe re di-nivîsin, hûn xwe dixapîn. Bi van nivîsandinê ne rast, hûn xwe dihetikîn. Hûn li dînyayê hetikîne, lê haya we ji we tune ye. Aqlê xwe werîn serê xwe û rastiyê bibîn. Ji ber van derew û hetîketiya (rûresîya) we, rojnamen we di cihê xwe di dimîn. Hejmara rojnamen we, wek terya kerê, zêde nabin.

Lê em bawer nakin ku rojnamevan û nivîskarêne qorziya xwe rast bikin. Lewra "Teriya kûcik rast nabe."

Mandelayê hêja, ez silavê şoresserî ji te re dişînim. Tu her hebî û jîndirêz bî.

Pereyên ku ji bo Erzincanê têne bi ku ve diçin?

Mebûsê Amedê Hatip Dicle û mebûsê Sêrtê Naif Güneş, li Erzincanê li ser rewşa gel lêgerînek pêkanîn û raporek amade kirin. Pişti zelzelê bi milyaran ziyana gel bû.

Ji bo gelê Erzincanê him li welêt, him jî li derveyê welêt, bi mil-yaran pere berhev bû. Nîvî vî pereyî negîhişte destê gel. Soz û peymana ku hikûmet dabû gel, bi cih neanî. Hikûmet li gelê Erzincanê xwedî derneket, ew di halê wî yê şerpeze de hişt.

Hatip Dicle û Naif Güneş di rapora xwe de wiha dibêjin: "Eger hikûmet naxwaze ku gelê Erzincanê bi hezaran dakevin sikakan û bi girseyî bimeşin divê ku guhê xwe bidin dengê wan û pirsên wan çareser bikin. Em dê li ser vê pirsê rawestin û dev jê bernadin, ta ku çareser bibe. Em xwe wek mebûsên Erzincanê dibînîn."

Panel ji bo 18'ê Gulânê

Li Enqerê xwendekaren Zanîngeha Hiqûqê (Ankara Hukuk Fakültesi) roja şehîdan a 18'ê Gulânê pîroz kirin. Nêzîkê 250 xwendekaren zanîngehê roja 17'ê Gulânê, di salona xwendegêhê de paneleki çekirin. Xwendekaren Kurd, di panelê de li ser jiyan û têkoşîna Hakî Karer û çar lehengan dûvedirêj rawestîyan. Rista (rol) van lehengê nemir a di têkoşîna rizgariya neteweya Kurd de anîn zîmîn.

Panel bi marşa 'Ey reqîp' destpêkir. Di panelê de hîlwesta (ta-vir) çapemeniya Tirk hate protesto kirin. Qetîşamên dewleta Tirk ên li Kurdistanê hatin lanet kirin. Di civînê de hin caran dengê axiftvanan bi dîrûşmeyê (slogan) 'bijî kongreya me ya neteweyî, serkevîn li Botanê, dilê me li çiya ye' dihat birrîn.

Wek ku tê zîmîn Hakî Karer di sala 1977 an de li Entabê ji hêla provakator û hevxebatkarêne dewletê ve hat şehîd kirin. Şehîdîn leheng (qehreman) ên nemir her tim di dilê gelê Kurd de dijîn.

Zarokêne kurd û 23'ê Nîsanê

Îsal 14 sal e Tirkîye di her 23'ê Nîsanê de gazî zarokêne gellek dewletan dike û vê cejnê (cejna zarokan) bi besdârî (katûlîm) ya van zarokêne dewleten din pîroz dike. Îsal jî ji 30 dewletan zarok hatin û ev cejn (îd) pîroz kirin, her yek ji wan bi zimanê xwe yê zîkmakî xeberda û kilam (stiran) got. Em û zarokêne xwe jî wan di televizyonê de seyr dikin. Lî gelo çîma zarokêne kurd bi zimanê xwe yê zîkmakî xeber-nadin û mîna zarokêne din kilaman nabêjin û nalîzin? Çi kîmasiya zarokêne kurd heye?

Dewleta Tirk dibêje: "Na, hûn bi zimanê xwe xeberne-din! Niha hûn bi zimanê xwe xeberdin, bilîzin û kilaman (stiran) bêjin, paşî hûnê da-wa tiştîn din jî bikin; li parlamîto, dibistan, dadgeb (mah-keme) û girtîgehan jî hûnê da-wa zimanê xwe bikin. Ev jî na-be, ev şixulekî mezin e."

Çîma zîmîn ne? Ma xeberdana bi zimanê zîkmakî ne mafê



Çîma zarokêne kurd bi zimanê xwe yê zîkmakî xebermadin û mîna zarokêne din kilaman nabêjin û nalîzin? Çi kîmasiya zarokêne kurd heye?

(heqî) me Kurdish e ji? Gelê me ji dixwaze bi zimanê xwe bixwîne, binivîsîne û di her warê jiyanê de çanda xwe bi pêş ve bibe û bigîhîje merhale-ya gelên azad.

Dewleta Tirk hemû riyê demokratik li pêsiya gelê Kurd girtiye û nijadperestîya xwe didomîne, guhê xwe nade daxwazîn demokratik ên gelê Kurd, lê belê behsa mafê Azerî û Tirkîn Qefqasya dike, dibêje divê Ermenî neheqiyê li Azerîyan nekin, lê ji aliyekevî ve jî gelê Kurd qirdike.

Serokêne partîyen Tirk û hemû mebûsên faşîst bi hev re diçin Qazakîstanê, Tacikîstanê, Azerbaycanê, Turkmenistanê û Kirgîzîstanê.

Dewleta Tirk xwe hildişîne nav van dewleten Turkî da ku problemen wan çareser bike. Ev ci ye? Te problemen Tirkîye çareser kirin ma yêne dewleten Qefqasya.

Divê gel li hember van neheqiyê dewletê bibe yek û bi xwe ji problemen xwe re çare bibîne.

Yurda Kaya

'Ewêñ ku destê xwe dirêji PKK bikin, emê destêñ wan ji ber de jê kin'

Eger Ehmedê Xanî sax bûya wê wilo bigota

● Eger Celal Talabanî lingê xwe li Konferansa Parisê nexista, ew "rewşenbirêñ" Kurd ên ku ji Ewrûpa dûverêzi hev bûne û çûne Konferansê tev bi caşekî Kurd re rûdiniştin! A rast, Fransa ew bi caşekî re didane rûniştandin. Divê barê de, em gotineke Ehmedê Xanî finine bîra xwe:

Namûs e li Hakim û Emîran Tewan ci ye şayîr û feqîran?

Gava "Libération", rojnameya sosyalistên Fransa, ji bo armancêñ xwe yên siyasi (yek jê Qerebaxa Bilind ji Azerbaycanê bistînin û bidine Ermenistanê) pişta Kurdan digirtin û serê Tirkiyê dikirin, perçak ji belavokeke Dev-Sol belav kirin. Tê de Dev-Sol wiha nivîsandibû: "Ewêñ ku destêñ xwe dirêji gelê Kurd bikin, em ê destêñ wan bişkêniñ". Eger Ehmedê Xanî sax bûya û ev gotina Dev-Sol bixwenda, wî jî wê wiha bigota: "Ewêñ ku destêñ xwe dirêji PKK bikin, emê destêñ wan bişkêniñ". Eger rewşenbirêñ 30 milyon Kurdên me bi hev re bibêjin: "Ewêñ ku destêñ xwe dirêji PKK bikin, em ê destêñ wan ji ber de jê kin", hingê mirov dizane heta ku derê bîr û baweriyêñ rewşenbirêñ me pêşve çûne; heta kuderê haydar in ku her carê gelê me ardûyê armancêñ siyasi ne; heta ku derê zanin ku Amerîkaya Bush, Fransaya Mitterrand û

Dewleta Tirk bi hev re dixebeitin ka wê çawa têkoşina çekdarî ya PKK vemîrinin. Hinekêñ wan (li Amerika) bi gur re miyê dikujin, hinekêñ wan (li Fransa) bi xwediyê miyê re şinê digerîn. Edî, ev tiştêñ wiha divê di serê rewşenbirêñ Kurd re derbas ne bin. Ma ji trajîdiya Kurdên Başûr wê jê hê mezintir bête serê Kurdan? Erê, wê jê hê mezintir bête ser Kurdan -vê carê Kurdên Bakur in- eger peya (uşaq) di Kurdan de hê ma bin.

Em carekê Konferansa li Parisê "Kurd: zanaveke Kurdî û Mafêñ mirovî" ku bûye bînîne bîra xwe. Yen ku hatine Konferansê ci kirin? Armanca siyasi ya Konferansê zamîn ci ye? Rast e xirabiyê Celal Talabanî hene, lê carna çeyiyêñ wî jî hene. Eger Celal Talabanî lingê xwe li Konferansê nexista, ew "rewşenbirêñ" Kurd ên ku ji Ewrûpa dûverêzi hev bûne û çûne Konferansê tev bi caşekî Kurd re



Eger Kurd, bi serokatiya PKK û bibin xwediyê wê Dewleta Kurdi wê berjewendiyê (menfîeten) Kurdan biparêze. Ji ber vê, Amerika naxwaze ev dewlet ava bibe.

rûdiniştin! A rast, Fransa ew bi caşekî re didane rûniştandin. Divê barê de, em gotineke Ehmedê Xanî finine bîra xwe:

Namûs e li Hakim û Emîran Tewan ci ye şayîr û feqîran?

Bi gotineke dinê, ewêñ ku guñehkar in ne şayîr û feqîran miletekî ne, lê hakim û mîrîn wî ne.

Mesela Kurdi li Fransa di

destêñ Danielle Mitterrand de bûye kertek û pê rûyê xwe li hember opozisiyonâ (Rastan) li dijî Sosyalîstan gewr dike. Bindesten doh iro ji min re bûne zordest! Em dostaniya kê be qebûl dîkin gava mesela Kurdi di riya PKK de were nas kirin, ne di riya peyan de.

Divê mirov bizane mesele ne

avakirina Dewleteka Kurdi ye. Dijminê me dixwaze bizane eger dewleteka Kurdi di navcê de çê bibe, wê bibe dijminê kê û hevalê kê. Ev ji bo gewrehêzen dinyayê girîng e. Eger Kurd, bi serokatiya PKK û bibin xwediyê wê Dewletê, ew Dewleta Kurdi wê berjewendiyê Kurdan biparêze. Ji ber vê, Amerika naxwaze ev dewlet ava bibe. Amerika dixwaze peyana xwe peyda bike, ji bo paşê ji xwe re bi kar bînîn, weke çawa bi serê Sedam Husêñ girtin û hîştin ku deh salan herbê bi Iranê re bike. Sibê, eger Amerika peyayêñ xwe deyîne, çawa xwestin, wê wisa kurdan ji xwe re bi kar bînîn.

Iro, rewşa berpirsiyaren Dewleta Tirk mîna rewşa karekteren şanogeriyeka Çêxov in. Sernivîsa wê şanogeriyê "Baxçê Kerezan" (La cerisaie) e. Hemû karakteren wê şanogeriyê di dudiliyê de dijîn, nizanîn ci bikin, tev li xwe heyrîne, nexwêş bûne, nikarin bîryaran bistînin. Iro, berpirsiyaren Dewleta Tirk karekteren Çêxov in. Eger mesela Kurdi di riya PKK re binasin, PKK partiyeka Kurdpârez e; eger pişta İsrail li dijî mesela Felestînê bigrin, lê 150 000 000 Ereb? Eger li ser mesela Filistînê li dijî İsrail rabin, cihûyên Ewrûpa û Amerika wê di serê wan de lêdin; eger li ser mesela Qerebaxa bilind dengê xwe bikin, Edward Darajîyan û Kissinger wê mesela Kurdi jê re derxîn; eger dengê xwe nekin, rûyê wan di nav Tirkân û Azeriyan de namîne; eger li ser mesela Qibrîsî bi Grêkan re rûnin. Amerika naxwaze problem li navcê çareser bibin. Bi kurtî, berpirsiyaren Dewleta Tirk desten xwe dane ser zikê xwe û Amerîkaya Bush şireten xwe ji wan re disîne: "Realiya Kurd, Partiyeke Kurd, televiziyoke Kurdî, Programa Kurdi li Radyoya "Dengê Amerîka" û hwd...".

M.Ali Tüysüz

Pirsêñ civakî û mafêñ Kurdan ên neteweyî

Wek hemû civatêñ din, endamêñ civata me Kurdan jî xwediyê jiyanekî fizîkî ne. Di jiyan (heyat) a civakî (sosyal, toplumsal) de dikare jiyanâ mirovan dewlemend û serkefî be. Lê jiyan dikare xizan û belengaz be jî. Di civatek wiha de hîmê jiyanê qels û bê taqet e. Mirov û mîjîyêñ mirovan nebûye xwediyê huzûreke pirralî. Bi gotinek din, heger hîmê jiyanê qels be, dil, mîjî û her wiha jiyan jî qels e û ne azad e. Sedemêñ vî halî mîtingêhiye.

Di cihanê de hin civat, ji hînek civatêñ din baştir dijin. Rewşa hinakan jî pîrr xirab e. Li cihanê sistemêñ siyasi yên xirab û sistemêñ pîrr xirab heñe, encamêñ têkoşina mirovîn baş û bindest in. Mumkun e Ewrûpa, Amerîka, Japon û çend cih ên din xwediyê jiyanekîne baştir bin. Lê, ew jiyanâ başku ew civat tê de dijin, encamêñ pelçiqandîn û mîtina civatêñ din in. Ewrûpa bi sedalan Efrîka, Amerîka Lañîn û Asya; Japon nîvî Asya; Amerîka jî hemû cihan demekî dûr û dirêj mîtiye. Lî dîsa jî, her çiqas jiyanâ madî li wan deran baş be jî, mirovahî hîn negîhîştiye jiyanekîne dewlemend a pirralî. Lewma di navbera mirovan de wekheviya aborî tune ye.

Heger mirov li civata me Kurdan binêre û rewşa ku gelê me têdeye bide ber civatêñ din û di çend waran de bixwaze

muqyesan bike, mirov dikare bîbêje îmkana muqyesekîrinê tune ye. Ji ber ku hîn pîrseke me di tu warekî de çareser nebûye. Tu dibê qey gelê Kurd hîn di merhela zayinê de ye. Hîn dest bi axaftinê, hîn dest bi stiranê nekiriye. Jiyanâ gelê Kurd dişibe jiyanâ zarokên yek salî. Wek zarokên yek salî gelê Kurd jî hîn dest bi axaftina çend gotinan kiriye. Hîn me dest bi dibistanê nekiriye, hîn em nizanîn bîxwînîn û binivîsînîn. Hîn me ji bo jiyanekîne azad dest bi xebatê nekiriye. Hîn em nebûne xorîn azad yîn bîst salî.

Li cihanê qet civatek tune ye ku ayaftina wê qedexe ye. Hemû pirsêñ me bi azadbûn û serxwebûna welêt re hal nabin. Ji bo

kirine. Hemû xwedî dewlet in. Rewşa civata me, bi me bi xwe ve girêdayî ye. Heger em bixwazîn, em ê bikarîbin rewşa iro ku gellek xirab e, ber bi bâsiyê ve bîbin. Ew rewşa ku gelê me têde ye ne rewşa ku mirov pê sa bîbe. Ne tenê welatê me hatiye dagîrkirin (îsgal kirin) û dewlemendiya axa me tê mîtein. Lî her wiha pêşya mezinbûna me, ayaftin û fîrbûn jî ji me hatiye girtin. Niha em zarokên yek salî ne û dixwazîn bîmeşin. Icar ji ew dixwazîn lingê me jêkin, zimanê me ji kok ve hilkin.

Ji bo çareserkirina pirsgirêkîne yên neteweyî bê têkoşînê rî li ber me tune ne. Lî hemû pirsêñ me bi azadbûn û serxwebûna welêt re hal nabin. Ji bo

**Hîn me dest
bi dibistanê
nekiriye, hîn
em nizanîn
bîxwînîn û
binivîsînîn.
Hîn me ji bo
jiyanekîne
azad dest
bi xebatê
nekiriye. Hîn
em nebûne
xorîn
azad yîn
bîst salî**



Doh êvarê ez bi tenê bûm. Pişti ku min guhdariya radyoya BBC kir, ez agahdar bûm, ku li welat li her deran ser û serhil-dan hene. Min radyoyê girt û paşê di odayê de bêdengiyêke mezin serdest bû. Hingê min ji xwe re got, "De ka ez telefonê malê bikim, ka çi heye, çi tune ye." Pişti bêhnekê, ku ez bi telefonê ketim, xeta Cizîra Botan vebû:

-Elo

-Ha yadê tu yî. Roj baş

-Roj baş kurrê min. Welleh lawo ev roja me û hemû rojên me, hema her tim ser û serhil-dan in.

Di cih de min famkir, ku di ya min, ne ew diya sala 1979 an e. Wê demê ne dihîst ez pirtûkeke jî bibim malê. Heke ne dengê wê bana, min dê bi-gota, ev ne dayika min e.

-È yadê, ew mirovên li der-dorêne we çawan in.

-Mirovên çi?

-EZ behsa wan, yanê ez behsa yê din dikim.

-Ha... min famkir. Binêr lawê min, heke hûn ewqasî bi-tirsin, telefonê nekin çêtir e. Ma em di navê de ne natirsin, vêca hûn li Ewrûpa ne ditirisin. Guhêñ xwe bide min: Kî guhdariya telefonê jî bike, cehna-me wî kirî. Gerilla her roj têna ba me, malê. Carinan bê xew in, ez nobedê jî li wan digirim. Ji xwe êdi hemû kes gerilla ne. Şeva ku dengê gulleyan neyên me, em nizanin razen. Ev e hefteyek e, ku roj nîne çend "özal tim" û esker geber nebin.

*Niha li
welatê me,
heristik jî
nuh ve
ava dibe.
Di navbera
niha û sala
1979 an de,
ne tenê
13 sal, belkî
100 sal jî
hene. Pirsa
rizgariya
welat jî, êdi di
pratikê de
bikartê.
Zû yan jî
dereng, kengê
mabe,
wê nîrê
dagîkeriyê ji
ser welat
û
gel rabe*

De ka bibêje hûn ci dikan, xe-bata we çawan e.

-Yadê, ev e du heftê ne, min di yekîtiya karkeran de cih gitte.

-Ser xêre be yekîtiya we. Tu dizanî li ba me belkî sed komî-teyên jinan tenê hene. Tevlî-hemû kêmâniyên me yê teknî-kî jî, milet weke agir dixe-bite.

Rojnameyê Berxwedan û

Serxwebûn têne zêdekirin û belavkirin. Alayê ERNK ê wêneyê Serok jî têne çêkirin. Ji xwe her kesek êdi dizane wêneyê Serok bi nexşan ezber çêbike.

-Erê yadê, ji xwe şoreşa Kurdistanê şoreseke demokratikî û neteweyî ye û...

-Xwiya dike tu hîna mîna berê yî. Kurê min berî 12'ê



Dayikêne êdi di riya avakirina jiyaneku nuh de tim amade ne.

ilonê we serê me dibr. Nizanîm hinekan digot şoreşa Kurdistanê şoreseke neteweyî û demokratikî ya gelî ye, hinekan jî digot na... şoreşa avakirina sosyalîzmê û civaka bê çin e. Hinek ehmeqên din jî digotin, riya xilasiya Kurdan ji Enquerê derbas dibe. Ka ew efendî-mefendî li ku ne?

Ez qûrbana Serok bim. Ev tenê ji heqê wan derket, virr û derewên wan baş eşkere kir.

-Dayê, wellah tu kesek bi wan sekreteran re nemaye. Gel-

niha û sala 1979 an de, ne tenê 13 sal, belkî 100 sal jî hene. Pirsa rizgariya welat jî, êdi di pratikê de bikartê. Zû yan jî dereng, kengê mabe, wê nîrê dagîkeriyê ji ser welat û gel rabe. Dema dengkirina vala û zimandirêjiyê derbas bûye. Dem dema kar û xebatê ye.

-Dayê em heqê Ewrûpa jî nexwin. Li vir jî, belkî pirr kêm be, lê xebatê hey.

-Em heqê kesekî naxwin. Mesele rastiya prensibân e. Pirsa pirsa di riya serxwebûn û azadiyê de bilindkirina tempo-ya xebatê ye. Bes e perçebûn û xwe windakirin. Kesê dixwaze bila kerem bike, tevlî yekîtiya gel.bibe, ku di meydana cengê de, di nava kar û xebatê de bi xwîna şehîdan ava bûye.

-De baş e yadê, tiştekî din dibijî?

-Na kurê min, silavan bike. Kar, xebat û têkoşîna me bi te-vayı bas e. Zivistan derbas bû. Gava Newrozê dewleta dagîker ji binî ve hejand. Pirsa partiyê jî pirsa xwirkirin û yekki-rina hîma şerê gerilla û serhil-danan e. Kêmanî bi dijwarî ji holê radibin. Heval û teviya gel pirr bi moral hereket dîkin. Ko-ordînasyon bêhtir navendî dibe û komîteyên bi dizî yê serhil-danê dijmin gêj dîkin.

-Ha yadê nuh hate bîra min. Vê meha dawiyê çiqasî ez tele-fonê dikim kes li malê nîne. Ev xêr e? Ci dibe?

-Rast e, hûn dizanîn, civînîn me dîsa dest pê kirine. Ji sibê heya êvarê civînîn komîteyên gel çêdibin. Haziriyê hilbijar-tinan têne kirin. Ez jî tim bi he-valan re digirim. Zarok jî kar dîkin, bavê te jî li mal naseki-



Desten bi xwîn nişana serfîrazi yê nel

lek ji wan jînên xwe jî berdane. Hinek nîv-sekreter û nîv-reşenbîrên dizek jî, jînên xwe yêne ji welat bi xwe re anîbûn bi jînên porzer û ciwan guherîne. Hinek jî, ji bo peran jînên ji diyen xwe mezintir mehr dîkin.

-Rast e kurê min, tu bibêjî-nebêjî ez dizanim. Ka li ku derê ne, ci dîkin? Ci planêne wan hene? Ew dizivirin-dizivirin û di dawiyê de dixwazin kesen weke Zekî Okçuoglu û Şerafettin Elçi bikin wekîlên xwe. De ka em bela xwe ji wan vekin. Heyf e mirov zemanê xwe li ser wan winda bike.

Niha li welatê me, heristik ji nuh ve ava dibe. Di navbera

ne. De haydê şev baş bi xatirê we. An serkevtin an mirin!

-Şev baş dayê, oxir be.

Min destkî telefonê danî, belê gotinê dayika min ên mîna koordînasyon, perspek-tîv, prestroyka, komîteyên ser-hildanê yêne dizî di guhêñ min de çingînî dikirin. Dîsa min jî xwe re got, ev diya min têkilî dîserke çawa bûye? Di navbe-ra salen 1979 û 1992 an çend sed sal derbas bûne? Ci heye, diya min gerilla, serhildan, xwîdana zend û benden partiyê û Serokatiya partiyê ne, bila tim bijîn.

R. Cizre

Civînek li ser bîranîna şoresgera nemir Roza



Fatma Zeyto - Roza

Lubnan-Beyrût (Welat) Li Norsînê ku girêdayî Bed-lîsê ye, keça Kurd Fatma (Roza) fişeka dawiyê xiste serê xwe û bi qehremanî te-qand.

Hevala Roza li Lubnanê mezin bûbû, binyada wan Mêrdîn bû. Lî weke gellek malbatên Kurd ji bo debâriyê berê xwe dabûne Lub-nanê. Pişti ku tevgera rizgariya Kurdistan li hemû alîyên welat xwirt dîbe, keç û xorîn Kurd xwe digihînîn refîn gerillayê ARGK.

Yek ji wan keçen Kurd rîheval Roza bû.

Ji bo bîranîna şehîdbûna hevala Roza li Lubnanê ci-vîneke fireh hate çekirin. Di ci-vînê de gellek kesen mîvan (Lubnanî, Filistînî) hebûn. Di bin alîn PKK, ERNK, ARGK û wêneya

Roza di mektûba ku ji dê û bavê xwe re şandibû de wiha digot:

"... Yadê, yabol

We baş nas kiriye derdê gelê Kurd ci ye, we riya xelasiyê dîtiye. Divê mirov bizanibe û bibîne û nas jî bike, lê belê zagonê (qanûnê) jiyanê hene, yek ji wan qanûnan jî ev e: Ji bo ku em xweşiyê bi dest xwe ve bînin, zor û zehmetî gerek e, ev jî rastiyek. Daxwaza min ji we ew e ku hûn li pey min xwirt bibin û di riya şehîdan de bimeşin..."

Serok Apo de ci-vîn bi deqeye-ke sekinandinê dest pê kir.

Gellek axaftinê siyâsî hati-ne kirin. Diya Roza jî axafti-nek li ser keça xwe Roza çêkir. Wisa jî nameyeke ku Roza ji mala xwe re şandibû hate xwendin, kurtî perçeyekî ji wê nameyeke wiha bû:

"... Yadê, yabol!

We baş nas kiriye derdê gelê Kurd ci ye, we riya xela-siyê dîtiye. Divê mirov bizanibe û bibîne û nas jî bike, lê belê zagonê (qanûnê) jiyanê hene, yek ji wan qanûnan jî ev e: Ji bo ku em xweşiyê bi dest xwe ve bînin, zor û zehmetî gerek e, ev jî rastiyek. Daxwaza min ji we ew e ku hûn li pey min xwirt bibin û di riya şehîdan de bimeşin...

Hûn li pey min xwirt bibin û di riya şehîdan de bimeşin...

Diya heval Roza pişti xwendina nameyeke, bîranî-neke xwe bi Roza re ji mîvanan re got: "Mala apê Roza ji bo xwestina Roza ji kurê xwe re mektûbek ji me re ji Mêrdînê şandi bûn. Di nameyeke de nîrîna me dixwest in. Min gote keça xwe Fatme: Apê te wiha dibêje. Nîrîna te ci ye? Got: Ez tu bersivan naşînim ji tu kesan re. Min got: Keça min, êdi tu mezin bûyî, divê tu biçî ser nesîbê xwe. Keça min got: Belê dayê ezê biçim ser nesîbê xwe, lê nesîbê min jî welatê min Kurdistan e..."

Bi sloganê weke "bijî Serok Apo! Şehid namirin..." ci-vîn dawî pê hat.

İlm ne haceta xapandinê ye

● Heger civakzan ilm li dij mirovatiyê, azadî û rizgariyê an jî li dij rîvebir û serokatiya şerê berxwedan û serxwebûnê bixwazin bikar bînin, ew ilm ji ilmtiyê derdikeve. Di rewşekê wiha de, zanistî dibe hacete hov ku ew ji ilm û mirovatiyê re xirabiye ka herî mezin e

Cumalî Cotkar

Wek her ilmî, ilmî civakî û ramyarî (siyasi) jî divê di xizmeta mirovatiyê de be. Divê zanist (ilm) nebe hacete hov ku di her war û rewşê de mirov pê were xapandin an jî mirov pê were êşandin. Ilm berî her tiştî, ji bo baş dîtin û guhertina rewşan hacete e. Ji bo pêşvexistin û başkirina jiyana mirovan gelek teorî û metodê zanistiyê derdixin holê.

Bi pêşveçûna şerê berxwedan û azadiyê, xebatê rewşenbîrî û kar û barên pratiyê yên rojane, zanistiyâ civakî "ku berê tenê teoriyên siyasi bûn" li welatê me bû małê milyonan mirovîn me. Bîr û baweriyê pêşverû, ramanê (fikrîn) welatparêzî bûn pîvan û demanê hisyarbûnê. Ji bo çareserkirina pîrsîgîrêkîn gelê Kurd di ilmî civakî de metodê pêwîst derketin holê. Zanistî ji formelbûnê derket, bû xwediyê naverokekê ku mirovahî pê pêş ve here. Beşek ji zanistiyâ civakî, ji bo azadbûna gelê Kurd bû hace-

tek. Jiyan û xwe parastin, bi vî beşî dewlemed bû. Ji bo pêşveçûn û serketinê, teoriyên ku di gelek sedsalan de hatine avakirin, ji bo gelê Kurd dibin krîter û bingehêne xweafîrânîne. Rizgariya gelê me, serxwebûna welatê me, dê bi eynî awayî, bi cih anîna metodê zanistiyâ civakî mumkun be.

Lê, li aliyê din gelek zana û alîmîn me yên kurmî hene. Gelek ji wan li derveyê welêt, bi taybetî li Ewrûpa dijîn û li wan deran jiyana xwe yê "ilmî" didominin. Hinek ji wan, di salê 1970'an de li ser pîrsîn welêt, li ser avahiyê civakî û çînî, bûbûn gurê zanistiyê. Di vî warî de gelek tiştî hatibûn nivîsandin, gelek rîexistin û partî hatibûn damezirandin. Gelek ji wan guran niha bûne rovî. Çendek hîn jî, bi hezeran km dûrê welat, di gurbûnê de israr dikin. Hinek zana û alîmînuh jî derketinê û dixwazin bibin gur. Gurê kevn, deh salin welat nedîstine û nuh jî bi berçavik (gozlig) û pivanê Ewrûpa, bi demokrasiya Ewrûpa li pîrsîn welêt



û rîvebirê şerê azadîxwaz dinîn. Rexne li bîr û bawerî, çalakî û xebatê şoresger di-barîn. Erisê, têkoşîna welat-parêzî şoresger dikin.

Ew hemû li aliyekî, ziman-dîrîjiya wan gelek caran bi navê ilm û welatparêzîye di-be. Xwe, bi paş gotin û peyvîn zanistî vedîşerîn û gelek tiştîn ku ne di cih de ne dibêjin. Mirov dikare gelek dîtina li ser gelek kesan bibêje. Lê, li vêderê wê bi tenê behsa zanistiyâ wan bibe. Bi kurtî, mirov dikare bibêje; zanistî ji bo hineka tiştîkî formel e. Ew tîpana, zanîna xwe wek gulan, an jî wek surî ji mirov û mirovatiyê re dikin. Bê ku zanebûna xwe di jiyanê xin (derbasê jiyanê kin), xwe wek

otorîter û pîsporê her rewşê û her demê dibînin. Zanistî ji bo van yekan bûye hacete ku ew xwe, di her war û rewşê de biparêzin û xwe bidin qebulkirin. Populîstî, xweperesti (egoîzm), kariyer û di her wa-rî de dijîtî û dubendî, di her axaftin û nivîsîn wan de xwe nîşan didin. İslûb û awayê munâqşen wan tîjî demegojîye. Lî, ew, ê din bi demegojîbûnê û tham dikin. Her çiqas, rewşa welêt, xebatê ku li welêt ji bo rabûneka giştî di-bin, di van çend salê dawî de, rî li ber demegog û tûjikan girtiye, hin jî ji van tîpana re, çend qul û quncikên Ewrûpa hene. Ew, ilm îstis-mar dikin. Ilmî wan dibe tiştekî bê bingeh û formel. Ew, xwe di nav çarçova forma de dihîlin û ji bo wan ilm û çarçova ku ilm dixwaze parce bi-ke, cih bi hev diguhare. Bi vî awayî, ew di nav çarçova ilm de winda dibin û difetisin. Dî-warê forma ilm ji bo wan dibe dîwarek bi hesin ku nayê hil-veşandin.

Li aliyê din, heger civakzan ilm li dij mirovatiyê, azadî û rizgariyê an jî li dij rîvebir û

serokatiya şerê berxwedan û serxwebûnê bixwazin bikar bînin, ew ilm ji ilmtiyê derdikeve. Di rewşekê wiha de, zanistî dibe hacete hov ku ew ji ilm û mirovatiyê re xirabiye ka herî mezin e. İncax zane, zanebûna xwe, di rewşan de bi cih bike, dikare zanistî xwediyê naverokekê be. Ü her wiha bi guhertina rewşan dikare zanistî ji formelbûnê azad û xelas be û bibe beşek ji jiyanê. Ji bo vê yekê salê car-ek an jî çend car di civîn û konferansan de beşdarbûn, rexnebarandin û xwevalakirin zanistiyâke formel û erzan e. Ü herwiha naz û xwebihafiro-tin ji hesabê zarok û bazarê ye. Li pêşya civatzanê Kurd du rî hene; Yek ji van ji bo azadî û serxwebûnê xebat e, di xizmeta gelê Kurd de bi awayekî beşdarbûn e, bi awayekî, ji şoreşê re alîkari ye. Riya din jî riyeke xirab e. Li dijî têkoşîna gelê Kurd rawes-tin xirabiyeke pirralî ye. Xayintî ne pêwîst e ku tim vekirî be. Xayintiya dizî, ji xayintiya vekirî xeterter (talûketir) e. Xayintî ji xwefiroşî ye.

XACEPIRS

Amadekar: Rasto Zilani

Çepebast:

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1- Hazir./ Navê Se-rokê Kong-reya Effîqa ya Netewe-yî, di wêne de tê dîtin.	1											
2- Bernavê parlamentera Kurd./ Seydayê olî./ Nota-yek.		2										
3- Ya Netewe-yî, di wêne de tê dîtin.			3									
4- Dî-warê forma ilm ji bo wan dibe dîwarek bi hesin ku nayê hil-veşandin.				4								
5- Zaravayek kurdi./ Tiyatros.					5							
6- Celebeke xezalan./ Beşekî avahiyân mirov jê dikeve hundir.						6						
7- Nota-yek.							7					
8- Hesabkirin.								8				
9- Kinni-visandina Komela Ewrûpa (bi almanî)./ Jinbav.									9			
10- Celebekî çekan./ Sembola Sodyümê.										10		

ke xwînê./ Zana, zanyar. 4- Serokê fakulteyê./ Sembola Samaryûmê./ Lembeyên erebeyan. 5- Zaravayek kurdi./ Tiyatros. 6- Celebeke xezalan./ Beşekî avahiyân mirov jê dikeve hundir. 7- Nota-yek. 8- Hesabkirin. 9- Kinni-visandina Komela Ewrûpa (bi almanî)./ Jinbav. 10- Celebekî çekan./ Sembola Sodyümê.

Serejér:

- 1- Serbest, hurr./ Naveroka rojê. 2- Qumaşekî ne hêja./ Sembola Magneyûm.

BERSÎVÊN XACEPIRSA HEFTİYA ÇÜYİ:

Çepebast: 1- Zilan./ Ararat. 2- Iraq./ İmadiye. 3- Rawir-tî./ Azeb. 4- An./ Lîanîn./ Ta. 5- Vîn./ We./ Rîs. 6- Egîtî.

7- Veto. 8- Merwanî. 9- Lîwa./ Rez. 10- Anene./ Ha.

Serejér: 1- Ziravav./ La. 2- İranî./ Emîn. 3- Law./ Nete-we. 4- Aqil./ Goran. 5- Rêwî. 6- İtaetkar. 7- Amîn./ Neh. 8- Ra./ Rîza. 9- Adanî. 10- Rîz. 11- Ayet. 12- Tebax.

Pirsa Kesayeti

Weke tê zanîn pirtûka Pirsa Kesayeti di Kurdistanê de ya ku ji hêla serokê ERNK Abdullah Ocalan ve hatibû nivîsandin, di Tîrme 1983 an de hatibû weşandin. Ew pirtûk di 1986 an de bi erebî hatibû belavkirin.

Ji ber ku pirtûk bi naveroka xwe cara yekemîn e pirsa kesayetiye şirove dike, ci ji bo civaka Kurd û ci jî ji bo civakên din, pêwîstî hate dîtin ku ew pirtûk ji bo kurdi-soranî were wergerandin.

Birêz Mehabad Kurdi pirtûk ji erebî wergerande kurdi (hejmara rûpelan 582 rûpel in.) Pirtûk ji hêla Weşanên Serxwebûn ve hatiye çapkirin.

Navê pirtûk bi soranî ev e: Pirsi Kesayeti le Kurdistan da, Taybetmendiyekanî Xebatgêri Şoressêr û Jîyanî Partî.

Agri Verlag Vogelsanger Str. 286 D-5000 Köln 30) BRD

پرس کسایتی لە کوردستان

تایبەتەمەنکانی خەباتگەری شۆرەشگەر و ئازادی پارول

• • •

دەوگەن و پەنچەنگى

سەھابىد كەردى

• • •

WEŞANÊN SERXWEBÛN

"Pirsi Kesayeti II Kurdistan da"

NEQUSK
Amadekar
Aram Çem



Zimanê te xîreta te ye. Zimanê
xwe paş de bistîne. Bêxîretiyê
nekişîne!


Wedat Aydin

Komcivîna konfederasyona dîkzade û qumrîzade

Komcivîna Konfederasyona Federasyon, Yekîti û Komeleyen Kurd li Swêdê, di xaniye Pîskopos û Keşîş Arne de, li dar ket.

Nûneren(temsilciyên) 44 komeleyen(dernekên) bênav û nîşan, 12 federasyonên bê endam û 3 yekitiyên mirî û nîvmirî besdariya komcivînê kirin. Li ser nav paşnavê van rînexistinan, 19 nûneren hilbijartî û 27 nûneren nehilbijartî li komcivînê amade bûn. Serokê Konfederasyonê Birtane 'Evdêxwedê, komcivîn bi awayekî pîr demokratik vekir.

Bi tevayiya dengan Hesen Dîkzade ji bo serokatiya, Evdilzinar Qumrîzade jî, ji bo sekreteriya(ev heval bi salan e, sekreterê sekreteran e) dîwanê, bi rîyeke gelek demokratik hatin hilbijartin.



Wêneyek ji komcivînê:
Hesen Dîkzade û
Evdilzinar Qumrîzade

wanê, bi rîyeke gelek demokratik hatin hilbijartin.

Hesen Dîkzade axîneke pîr pîr kûr ji bo Welat kîşand û serê xwe bir û anî û dest bi girînê kir.(Ev heval ji berê ve di civînan de digirî) Nûner şas man û dilê gellekan zîz bû. Paşê ji nûneran yekî, qevdeki gulêng rengîn dan serok.

Pîstî vê seremoniyê, serokê dîwanê dest bi karê xwe kir û got:"Di nava me de, mîvanen giranbuha, qedirbilind, birêz, bi rûmet, hêja û bi nîrx hene

geli hevalan! (Nûner cepikan lê didin, serok demek radiweste) Belê, di nava me de hevalen xwedî tecrube, zana û "şoreşgerên" bi salan hene, gelî hevalan! 12 serok û sekreteren partiyen me Kurdan di nava we de ne gelî nûneran! (Nûner hin jî bi xwirtî cepikan lê didin. Tevahiya van sekreteran li taxekî Stokholmê rûdinin û pirraniyan dikandar in.)

8 serokên berendam(aday) jî, bi hatina xwe şeref dane komcivîna me.(Ev heval jî wê di van rojan de, partiyen xwe yênuh ilan bikin. Serekîn berendam jî, cîranê serokên esîf ne.)

Di komcivîna me de, 22 heb kevneserok jî hene. (Salona civînê ji tezahuratê

Nûneren(temsilciyên)
44 komeleyen(dernekên) bênav û nîşan,
12 federasyonên bê endam û 3 yekitiyên mirî û nîvmirî besdariya komcivînê kirin. Li ser nav paşnavê van rînexistinan, 19 nûneren hilbijartî û 27 nûneren nehilbijartî li komcivînê amade bûn. Serokê Konfederasyonê Birtane 'Evdêxwedê, komcivîn bi awayekî pîr demokratik vekir.

Bi tevayiya dengan Hesen Dîkzade ji bo serokatiya, Evdilzinar Qumrîzade jî, ji bo sekreteriya(ev heval bi salan e, sekreterê sekreteran e) dîwanê, bi rîyeke gelek demokratik hatin hilbijartin.

diheje.) Nûner herî pîr ji kevneserokan hez dikin. Van hevalen partiyen xwe belav kirene û niha bi dikan, restoran, pizza û tiş-miştî din re mijûl in. Ji bo zanîna hevalan divê ez bêjim, ew 8 serokên berendam ku me li jor behsa wan kiribû, bi xwe kevneserok bûn. Lî ji ber ku karê wan ê ticaretê baş neçû yanî iflas kir, dîsan ji xwe re vedigerin karê xwe yê berê. Ji bo vê yekê divê herkes ji xwe re partiyekê nuh çêke. Axir ji we xwiyaye, ev kar qasê ku

mirov bawer dike ne rehet e.)

Mîvanen komcivînê pîr in. Hesen Dîkzade dom dike: "Nûneren sê cepheyen Kurdistanê jî li vira ne. Ji cepha TEVNEGER, heval Çîya Deşti.(Tevneger, ji 11 partiyen jorîn yê esîl çêbûye) Ji cepha Radikal, Çekdar û Têkoşer heval Rûbar Çem. (Ev cephe jî, ji 12 partiyen jorîn çêbûye. Ji bo ku partiyek nexwestibû di Tevneger de cih bigre.) Ji cepha Radikal Çekdar Têkoşer û Tevneger jî heval Derya Bêav. (Ev cephe jî ji wan herdu cepheyen jorîn pêkhatiye)" Nûner ji cephan re zêde cepikan lê na-xin. Serokê dîwanê di derbarê nûner û mîvanan de, agahdariyek din jî dide û dibêje:"Ji 47 nûneren komcivîna me, 41'e wan hem nûnerê konfederasyon û hem jî nûnerê partî û cepheyen mîvan in. Ew şesê mayîn jî karmendê (memurê) konfederasyonê ne. Ev rewşa ha jî xwirtî, militanî, kûrfî, kollektifî, aktifî û demokratiya konfederasyona me nîşan dide.(Nûner baş dizanîn ka kengî ew cepikan lêdidin. Serok çaxa peyva "dide" diqedîne, dengê cepikan bilind dibe.)

Pîstî nasandina mîvanan, komcivîn du saet navber dide. Lî nûner incej ji çar saet şun ve têna salona komcivînê. Piraniya nûneran westiyayîne. Nikarin li kesî guhdarî bikin. Diçin der û ji xwe re çixare-mixare dikşînîn. Çend nûneren jin jî ji komcivînê di-pirsin ka çima mîr piştigiriya jînîn feminîst yêndîn Kurd nakin.

Evarê konfederasyon, nûneran vedixwîne (dawet dike) xwarin û vexwarinê. Nûner ji bo Kurdistanâ şîrîn dixwin û vedixwin. Heta derengiya şevê bi seriye kî "xwes" govenda welat dîgrin.

Komcivîn, roja dinê dereng dest pîr dike. Hevalen nûner bê xew in, serê wan dêse. Serokê konfederasyonê dixwaze bi çend gotinan behsa kar û xebata konfederasyonê bike. Lî nûner gelek xwe aciz dîkin û yek ji wan radibe li ser xwe û gelek bi hêrs dibêjê: "Ma 'eyb nine, tu hatî wekî ku hesab bidî me behsa kar û xebatê dikî! Ma qey baweriya me bi hevûdu tune ye? Di navbera me de, tişteñ wiha çawa dikarin bibin? Ma em birê hev nîn in?" Serokê re-

TÎR

Musa Anter



Heywan jî dijminê xwe nas dikin

Heywan dijminê xwe bi bêhnê, bi dîtinê û bi destdanê nas dikin. Di tarixa islamê de hedîsek pêxemberê me wiha heye. Dibîn ji eshabiyen re digot: Filankeso kafire û wisa derdiget. Rojekê Hz. Omer dibê: "Ya Resulillah tu çawa wilo bi rastî tê derdixî, gelo Cebralî ji te re dibêje." Hz. Mihemed dibêje: "Na heyra ji bo naskirina dost û dijmina ne hewce ye ku mirov pêxember be û Cebralî wehî ji aliye xwedê ve ji mirov re bîne. Hûn jî karin tê de derxin. Hema binîrin bê hûn hez ji kî dikin, ew jî hez ji we dikin û bê hûn hez ji kî nakin ew jî hez ji we nakin."

Lê ez nizanim bê iro idara Tirkîyê dewa ci li me Kurdan dike, ma lawo serbextê we be hûn hez ji me dikin ku em jî hez ji we bikin? Ne min ji we re got heywan jî dijminê xwe bi bêhnê û bi dîtinê fêm dikin. Ma hûn herroj bên bavê me bişewitînin, zarokên me bikujin, namûsa me li ber lingan bidin, xaniyê me ku bi hiskberê bi ser me de bihediînin ma em dê çawa hez ji we bikin? Ma em Kurd wek heywanan jî nayênu ku em hez ji kumê we yê şin bikin.

Hevalen Tirkân pîrsek we heye, hûn dibêjin "Kalb kalbe karşıdır" yanî dil miqabilê dil e. Wileh hûn ji xwedê yeqîn bikin heta ku karê we ev kar be em hez ji we nakin. Ü hûn jî zanîn ku di ilmî sosyal de qaide ye ku tiştekî mirov jê bitirse mirov hez jê nake. Belkî niha hûn di dilê xwe de dibîn qey hûnê Kurdan bitîrsinîn wê bi vî awayî bibin kolê we, lê ez dinêrim, îsal hezar sal e em bi hev re ne, ewqasî serê we hisk e hîn we Kurd nasnekirine. Gerek we zaniba em Kurd ne tirsonek in. Ma ne bi vê şeref û qabiliyeta xwe em di nav ewqas dewlet û mîleten zalim de mane heta iro me xwe gîhandîye vî hawî û em li ser lingan in.

De iça ka ez şiretekê li we bikim. Hûn dibêji Tirkân pê ve kes dostê Tirkân tune ye. Wileh hûn rastiyê dibêjin. Ev jî ji emelê we ye. Ma we kî bi xwe re dost hiştiye, Ereb, Ecem, Ermenî, Bulxar, Rûm û Yewnan we bi vê wehşeta xwe ji xwe re kirin dijmin. Maye maye di erênyayê de Kurd mane, hûn digerin ku wan jî bi dijminê xwe kin. È ma lawo Tirkino ku temamê dora we dijminê we bin û wek ku hûn dibêjin "bir Türk cihana bedeldir" yanî Tirkek pêşberê dînyayê ye ne wiha be hûn hemû yek yek Hezretî Elî bin hûnê ci bikin? Ez vê dibêjim ji ber ku niha di welatekî de em şirîkê hev in. Min navê belayek mezîn bê serê we eger hûn bi aqil bin ez yeqîn nakim, lê ez dibêjim ma heta niha hûn bi aqil nebûne ji niha û pê ve wê Siîman Demirel û Turgut Özal we bi aqil bikin? Lê dîsa jî min divê hûn hebekî hay ji xwe bikin. Biner welehî ku hûn xwedîyê xwe û vî aqilîn bin hûnê çem û çem herin.

ben mecbûr dimîne, ji kursiyê tê xwarê. Çaxa ku berpirsiyare malî rewşa serok dibîne, nema diwêre behsa rapora xwe bike. Berpirsiyare malî derdikeye huzûra komcivînê û bi tenê bi serê xwe silav di de komcivînê û dibêje: "Geli hevalan, hûn dizanîn 2 mîlyon kron hatina me ye. Îcar ez naxwazim behsa mesrefan bikim, ji xwe hûn jî destûnandin. (Nûner cepikan lêdixin)

Komcivîn di çend deqîqan de, dîsan eynî hevalan ji bo saleke din hildibijere û belav dibe. Lî tam wê gavê Hesen Dîkzade bang dike û dibêje: "Geli hevalan, me tû bîryar nestend, ma komcivîn bê bîryar dibe?" Ji bo vê yekê çend nûner ji ber deriyê der vedigerin. Yek ji wan diqîre û dibêje, serok binivsîne:

1-Em piştigiriya hêzên Kurd yê Başûrê welat dikin.
2-Em gelek başdibînîn, ku otonomîxwazên Başûrê Welat, diçin û têna Tirkîyê û dijitiya gelê Bakur dikin.

Yek ji bo otonomiya rastiqin pêwist e.
3- Em qiyemetek gelek mezin didin hilbijartina Başûr. Ji bo vê yekê em dê heyetek bişînîn Başûr.
4-Li dij sefareta İraqê em dê salê careki mitîngîkî bi sed-dusid kesî pêk binin. Yek ji nûneran dibêje: "Kekê em tiştekî jî ji bo Bakurê Kurdistanê bêjîn" Lî Hesen Dîkzade ji cihê xwe diqîre û dibêje:

- Ne keko na! Ma li Kurdistanâ Bakur ci heye ku em ci bêjîn?

Komcivîna konfederasyonê bi serfirazî, serbilindî û gelek bi keyfxweşî diqede. Dîrok dê vê komcivînê bi tîpên zêrîn û zîvîn binivîsîne!... Ji ber ku dîrok heta niha tu car nebûye dostê Kurdan!...

Têbinî: Me ji bo nîvîsandîna vê nîvîsarê, ji kovara konfederasyonê gelek alîkarî girt. (Hejmara kovarê ku çar meh piştî komcivîna van rojanan derçûye.)

J.Diyarbekirî

Di 18'ê Gulanê de kêliyeke bêdengiyê



Hakî Karer

Şehîd tovê jiyanê ne. Tu kes wek şehîdan ji jiyanê hezname. Ew hewçend ji jiyanê hezdikin ku dikarin xwe ji bo wê feda bikin. Hakî Karer ji yek ji wan pêşengên şehîdan e. Ew bi eslê xwe Tirk bû, lê di riya têkoşîna gelê Kurd de canê xwe feda kir; şehîd ket.

Hakî Karer wiha digot: "Ev bar ne tenê barê gelê Kurd e, barê min e ji. Ev riya ku hûn li ser dimeşin ne tenê riya xelaskirina mirovîn Kurd e, riya xelaskirina mirovahiyê ye ji, ji ber vê yekê, ez xwe wek endamekî malbata gelê Kurd dibînim."

Berî ku destpêbikim û derbasî navâ jiyana nemiran bibim, ez kêliyekê (deqeyekî) li ser ruhê şehîdan diseke nim... bîranîna wan ronahiya riya me ye!

Ev roj ne mîna hemû rojan e. Stérka îşev pîr bi ronahî ye. Ne ewr e, ne mij e û ne ji dûman e. Berfeke sipî xwe bi ser ezmanan de vegirtiye.

Ev roj rojeye pîroz e, roja ku jiyana me tê de hatî afîradin, 18'ê Gulanê ye, Cejna Şehîdîn Kurdistanê!

Hîna me tiştek di derbarê wan de negotiye, em li serokê xwe guhdarî bikin... Ka ci dibêje: "Şehîdîn me 20-25 salî bûn. Wê sibê jiyaneke nuh li Kurdistanê çêbibe. Bi rastî her şehîdekî me mîna gulekî ye, dibêjine wê gulê gula Mihemedî. Wê her yek mîna guleke sor di cihê xwe de şîn we re... Şehîdîn me çîçekîn welêt in!"

Bi gurzêñ gul û gupikan, ez pêrgînî 18'ê Gulanê diçim, se riye xwe li hemberê gora leşkerê (serbazê) nenas (şehîd) ditewînim û van çend rezikan diavêjime ser:

Bibexşînîn, heya niha me nivîseke layiqî we, helbesteke li gora dilê we û xebateke wi ha serkevtî li ser riya we, me pêkneanîn. Biborînîn, hûn ji ezmanan bilindir in, ji deryayan firehtir in û ji her hêzê bi hêztir in. Emê ci bikin?! Ci ji dest me tê, em dikarin çawa bang û sloganâ te derbasî karvanîye bikin? Tu ewqasî mirovekî bilind ! Tu çawa dikarî xwe nesipêri dijmin û fişeka dawiyê de seriyê xwe de biteqînî! Ji vê lehengiya te ez tenê tiştekî dizanim: Qehremaniya te qehremaniya PKK ye!

Divê em şehîd û pakrewanîn xwe nas bikin, lê hema heya ku em dîroka derketina partiya xwe nas nekin em nikarin şehîdan ji nas bikin. Heya ku em destpêka partiyê ji bizanibin girîng e em vê gotina serok a jîrîn bixwîni: "Dema ku em bi rê ketin (di 70 an de) kesekî em nedipejirandin. Her kes li dijî me

bû, malbat, gund, bajar... û heya bi dostê me yê nêziktir ji, digotin: "Hûn dîn bûne, hûn hîna ciwan in, guneh e herin li xwendîna xwe binêrin. Pereyên we tune ne hûn pê çend nanan bikirrin, hûnê çawa Kurdistanê çê bikin!..."

Rast bû, ne qurûsek pere, ne silehek, ne fişegîk û ni ji hêzeke ku alkariya me bike. Berde alkariû piştgiriya me bikin, em ji hêla dost û dijminan ve dihatine teşhîkirin. Li aliye dewlet bi mirinê bi ser me de dihat û li aliye din hêzîn hevxebatkar. Her duyan hêzîn xwe kiribûn yek û mîna hovîn devbixwîn êrîş dihanîn ser me.

Sal 1977 bû. Em çend heval bûn cihê me yê razan û çekirina civînan tune bû, me nedikarîbû em belavokekî biwesîn. Emê ci bikin? Ci derf (îmkan) di dest me de he ne? Emê bi ci hêzê xwe ji êrîşa dijmin û hevxebatkaran biparêzin?.. Bi rastî bersîva van pîrsan gelekî zor bû, ji ber ku ji bilî du gotinan: 'Kurdistan heye û bindest e, divê were serbixwe kirin', tiştekî meteryalî di dest me de tune bû.

(...)

Baş tîye bîra min, hevalekî me yê pîrr hêja û bilind hebû,

ew ne Kurd bû. Min gelek caran ji wî re digot: "Barê Kur dan giran e, xwe nede bin wî barî, emê bi xwe barê xwe hilgirin." Digot: "Na! Ev bar ne tenê barê we ye, barê min e ji. Ev riya ku hûn li ser dimeşin, ne tenê riya xelaskirina mirovîn Kurd e, riya xelaskirina mirovahiyê ye ji, ji ber vê yekê, ez xwe wek endamekî malbata gelê Kurd dibînim."

Di 77 an de Hakî Karer li Dilûkê (Entab) bû. Di qehwe xaneyekê de pîrsa serxwebûn û azadiya Kurdistanê û navero ka Manîesto şirove dikir. Girûbek ji peyayê dijmin ku navê "stérka sor" li xwe kîribûn, êrîş anîne ser hevalê me Hakî û ew şehîd xistin... Belê ew roj 18'ê Gulanê bû..."

Li vir pirsek xwe di mejiyê mirov de dilivîne, şehîdbûna rîheval Hakî tê ci wateyê? Hakî Karer bi şehîdbûna xwe ya di 18'ê Gulanê de berpirsi yariya ci dike?

Dema ku dewletê desten xwe yê bi qirêj di riya kumek dûvelank re dirêjî jiyana Hakî Kirin, armanca wan ne şexsê vî hevalê me yê şehîd bû, Na! Xwestin bi şehîdbûna wî meşa me ya ku nuh bi rî ketibû bidin se kinandin. Ji hingê ve dizanîn û têgîhfîstibûn ku PKK ne ji bo

çend salan e, ji bo sedan salan e, wê meş gelekî dirêj bike. Rastiya ku derketiye holê ji ev e. Ji lew re xwestin bi lêdaneke xwirt re tehdîda mirinê bidin "şo reşgerên Kurdistanê". Gelo bersîva şoresh gerên Kurdistanê ci bû? Em bi hev re van çend hevokên serok bixwînin:

"Di 18'ê Gulanâ 1977 an de hevalê me Hakî şehîd xistin. Weke ku eşke re bibêjin: Ev e me dest pêkir, eger hûn nese kinin emê da wiya we bînin. Me ji got: Divê xwîna şehîd Hakî li erdê nemîne. Eger mirov di cih de

tola şehîdîn xwe ranake, hingê ew xiyanetê bi wan dike. Tu di ser şehîdbûna Hakî re derbas nebû, me heyfa Hakî hilanî. Ne tenê ev, me ga veke xwirtir avêt, ci bû? Ji bo ku em bîranîna Hakî bi cih bînin, me Partiya Karkeren kurdistan damezrand (...)"

Belê, bi xwîna Hakî Partiya ku fro rîberiya tevgera paras tina mirovahiyê dike, hate damezrandin. Rastî ev e, Partiya

ya Karkeran vê rolê dîlze, gelê Kurd ji yê ku bi mîlyonan xwe li dora vê hêza ku tu caran nayê revandin, dicivîne, gelekî serbilind û serfiraz e.

Ji lewre ev roja bi rûmet (18'ê Gulanê) di dîroka Kurdistanê de nîşaneke serkevinê ye, ne tenê ji bo gele Kurdistanê, ji bo tevayî mirovahiyê ev roj hilgavtineke azadiyê ye.

Li vir pirsek tê bîra mirov, gelo di Kurdistanê de şehîdbûn tê ci wateyê?

Bê gûman dema ku mirov li dîroka Kurdistanê vegere û hînekî rûpelân wê bide ber çavên xwe, wê bê dîtin ku tu welatan û tu gelan mîna Kurdistanê û gelê Kurd xwîn nerijandine. Ji dema ku feodalîst, sultanîn Osmanîyan, Farisan... û li vê dawiyê ji ji bo kapîtalîzmê rijandiye. Mirov dikare nav li vê kuştina ji ber xelkê ve bike "Şehîdbûn"? Na! Şehîdbûn ew e tu ji bo xwe jîyan bibî, dema ku hate xwestin ji ji bo xwe werî kuştin.

18'ê Gulanê berpirsiyariya vê rastiyê dike. Li hemberê ketinê di dîroka me de serkevîn e. Anglo di nava gerêneka mirinê de, guleke jiyanê ye!

Ey serbazê nenas!

Em li hemberê serbilindiyâ te serçok dibin û bi desten girêdayî xwe li pêşîya te diçemînin. Emê karwanê ku tu serkêsiya wî dikî, bê wester tabûn bajon. Ne diwestin, ne paşve dikişen û ne ji tu hêz dikare me bitirsîne. Ev in em di bin ronahiya we de mîna şeran diholin, dema ku were xwestin em goşte xwe ji dixwin, çavên xwe vedixewînîn û tu caran teslim nabin! Em ji destana berxwedana we dersen lehengiyê digirin.

Ne bi nivîs, ne ji gotin, em bi tifingan, bi gul û gupikan, bi soz û bîryaran 18'ê Gulanê, "Cejna şehîdîn Kurdistanê" pîroz dikin! Soz û girêdana me ya dawiyê ji bi şehîdan re ev e!

Em ji dil vê rojê li xwe dijîn şehîdan, li gelê Kurd û li serok û partiya xwe pîroz û bumbarekî dikin!

Dîbixwîn

Bijîşkekî Kurd li YDA xelata şerefê girt

Şahînê B. Soreklî

Li gor raporeke di derheqê bazirganên muhacir de hatî nivîsandin, li Australya pêşeroja aborî ê di dest bazirganên Çînî û Hindî de be. Li welatê wek Dewletê Yekbûyî yên Amerika (DYA), Australya û Kenede di sedsala 20 an de bi milyonan muhacir ji hemû besêñ cîhanê bi cih bûne û hejmareke mezin ji van muhaciran wek hemwelatiyê van welatan îroj bi rolêñ mezin radi-bin. Rolêñ muhacirê bi serketî, ne tenê ji bo welatê wan yên nuh, lê herwiha pîr caran ji bo welatê ew jê hâtine ji bi sûd (feyde, menfeet) û kelk (feyde) in.

Di 20 salêñ borîn de gellek kesen Kurd ji li van welatê û li welatê Ewrûpa bi cih bûn. Em hêvîdar in kesen Kurd yên ji welêt koçkirine, ew ji li warêñ xwe yên nuh bi serkevin û sûda wan herwiha bigihê neteweya Kurd...

Hin Kurdêñ li derive ji niha ve li welatê xwe yên nuh gavêñ mezin davêjin. Buleti-na KURDISH LIFE ya ku ji hêla pirtûkxaneya kurdî (ya Stî Vera Saeedpour) de tê weshandin behsa yek ji wan Kurdan dike, ku gelê Kurd dikare serê xwe bi xebat û berhemêñ wan rake. Ev Kurdê hêja Dr. Xazî Zîbarî ye.

Xazî di sala 1955 an de li Dehokê hatiye dinê. Li dû aşbetala 1975 an, Xazî ji wek bi hezaran Kurd neçar dimîne berê xwe dide Îranê. Ji wir, ew xwe digihîne DYA, jiyan li Amerika ji bo Xazî ne hêsan e. Divê ew îngilizîya xwe dewlemed bike û ji bo hewcedariya rojane kar bike, lê ew dest ji hêviya ku bibe bijîş, yanê tixtor, bernade.

Em ji Dr. Xazî bi dil û can pîroz dîkin û hêvîdar in, di salêñ li pêş de kesen wek wî li hemû welatê cîhanê rûmetê wisa bi dest xin.

wilo bi sanahî nikare kar û xebatêñ wan bîne ziman. Stran û marşen şoresserf û neteweyî bi şeweyleke xwirt te-sîra xwe li ser mîjiyên mirov dihêlin. Wextê min guhdarî "Meşa Azadî" kir, saz û hes-teka pîr bilind di dilê min de peyda bû, saz û hesta Kurdistanê azad û serbixwe. Wê rojek bê "Meşa Azadî" di gel meşen serbaziya Artêsa Rizgariya gelê Kurdistan li nav kolan û şeqamên paytexta Kurdistanê "Amed" de bête xwendin. Ev roj ji tim û tim nêzîk dibe û nêzîk bûye ji. Gel bi carek rabûye ser piyan û doza azadiya xwe dike.

Hunerkom her ji roja da-mezeandina xwe heta iro role-ke mezin leyistiye û dileyize ji, di xizmetkirina çand û hunera kurdî de. Bi rastî mirov

Di sala 1980 an de Xazî şehâdeya xwendina Kîmya û Bi-yolojîyê bi dest dixe û ji vir û şûn ve di nexweşxaneyan de kar dike, lê xwendina xwe ya bilind didomîne ta ku ew şehadeya majîsterê bi dest dixe. Di sala 1985 an de, zanînge-ha TENESSEE xelata şerefê dide Dr. Xazî Zîbarî. Ew wek xwendekarekî ku bi dijwartî û zehmetiya herf mezin xwendina bijîşkiyê kuta kiri-be tê hilbijartin. Dûvre Dr. Xazî di nexweşxaneyâ Zanîngeha Louisiana de du salan li ser hev, xelatan digire, wek bijîşkekî ku karê xwe bi hesasiyet û dîqqet kuta dike. Di sala 1991 an de Rêxistina Bi-jîşkîn Amerika ji xelata xwe ya mezin dide Dr. Azîz. Zanîngeha ew lê kar dike ji xelata ALPHA OMEGA ALPH-A dide wî.

Îroj Dr. Xazî Zîbarî di warê emeliyatên guhertin û bicikirina endamêñ bedenê de, yanê Transplant Surgery, li tevahiya DYA bijîşkekî bi nav û rûmet û deng e. Îsal Wezareta Pêwendiyêñ Derve di roja Penaberan de bi van gotinan xelateke teqdîrkirinê da ev bijîşkê Kurd, yê hêja: "Te ji ber stemkariyê dest ji welatê xwe berda û wek penaber hatî ev welat. Tu bê xweamadekirin gîhiştî vir, lê te dikaribû berhemêñ bi şan û rûmet ji bo sûda hemû hem-welatiyê DYA pêşkêş bikî. YDE ji te re spas dike, qedr û qîmeta te bilind digire." Li dû van gotinan, Dr. Xazî Zîbarî nameyeke pîrozkirinê ji Serokê Amerîkî George Bush bi xwe digire.

Nimûneyên vî rengî ji li nik min kêm in, wisan kurt in. Lê li gor karîna xwe ez dê xwe piçekî biwestînim ku li paş-



Folklor Botan -11- Panok (Pehnok)

Beşîr Botanî

Viyan û xwestin e, xêzkurt (setirkurt) û xêzhindik e, awaza wê bêhtir ji oktavekê (8 deng) ye û lêdana wê bi hêz e. Du texlît û curêñ wê ji hene.

1- Panok kurt e û weke miyamê tête stirandin.

2- Pesta wê, bi rîtm tête pêşkêşkirin.

Ev herdukan bi dengekî pan (pehn) têne stirandin. Peyva wê ya kurrû keçan e û li meyam û pesteyê evîndar bersîva hev didin û naveroka wê ji:

1- Viyan û xwestina evîndaran.

2- Pesn û hestêñ evîndaran.

Ev naverok di gel stirandinê bûne pêñasa panokê ye, ya ku bi viyan û hestan ve xemilandin. Panok tenê li Botan dihate stirandin, lê iro kêm nimûne mane û mixabin e ku ber bi nemanê ve diçe. Wekî ez dizanîm Kurdê Qefqasê ji stirani-ne belav kirin.

Nimûneyên vî rengî ji li nik min kêm in, wisan kurt in. Lê li gor karîna xwe ez dê xwe piçekî biwestînim ku li paş-

rojê belav bikim.

1- Çinara te me

Keç:Çinara te me Kesim im Ava Cizîra Botan Way bê te ne tiştekim Hay delalê dil û can

Kur:Bilbilê te me zer im

Ava Cizîra Botan Ji hêvînê dimirim Hay delala dil û can

Keç:Çinara te me reş im

Ava Cizîra Botan Hawar e lo nexweş im Hay delalê dil û can

Kur:Bilbilê te me spî me

Ava Cizîra Botan Ez ji bo te mirî me Hay delala dil û can

2- Eman

Eman neşîhanê Eman were canê Jiyana min Ax ji derdê te ciwanê

Sehran e l' Zaxokê

Govend e l' ber cokê Te çavreşê

3- Nazê - Zaxoka Behdînan

Hoy Nazê Nazê Nazê Hoy Nazê gerdengazê

Dengxoş î, hestawazê Hoy Nazê Nazê Nazê Ramûsim lo şerazê Hoy Nazê gerdengazê

Ne sivik im, ne naz im Hoy Nazê Nazê Nazê Bi evîn im tolaz im Hoy Nazê gerdengazê

Hoy Nazê Naza Zaxo Hoy Nazê Nazê Nazê Tim dilsoza dostê xo Hoy Nazê gerdengazê

Were biçin nav dara Hoy Nazê Nazê Nazê Rûnin gel dost û yara Hoy Nazê gerdengazê

Hoy Nazê tu naz neke Hoy Nazê Nazê Nazê Derdê dila gelek e Hoy Nazê gerdengazê

Çek û das û mokutêñ me Dil û mîj ji bo te ne Ta ku ala serxwebûnê Pûl bide em her hene

Semivîsa milletê Kurd Te iro bi xwe re anî Diqetîne zincîra ku Koletî bo me anî

Swed - Welat

Stiranek ji dikare rola xwe bileyize

Azadî" nivîsandiye. Kerem kin ev ji "Meşa Azadî":

Meşa Azadî

Bona serxwebûnê hatin em ji bo warê xwe ne Xakî Kurdistan aza kin Bona wê em her hene


PKK, her tim li pêş em can bi can li gel te ne Em ji bo te, tu ji bo me Tev ji bo niştê xwe ne

Her du baskên te li jorin ERNK û ARGK Cendî ew dijwar û zor in Soz û doza wan yek e

Meşa Azadiya me pirr Pirr bi hêrs û bi kîn e Partiya me al di dest de

MEHDİ ZANA

vahşetin günlüğü



DERKET

MEHDİ ZANA
'vahşetin günlüğü'

WEŞANÊN

MELSA

PÊNÛS

Amed Tigris



Welat û zimanê wê

Welat heta niha 13 hejmar derket. Ew di dema xwe de, bi rîk û pêk derdikeve. Bi rîk û pêk derketina rojnameyek cîdiyetbûna wê nîşan dide. Ez ji ber vê hindê dixwazim hevalen berpirsiyar û xebatkarên Welat bi dil û can pîroz bikim. Herwiha ez dixwazim di pratîka deh hejmaran de, li ser zimanê Welat çend gotinan bêjim. Divê neyê ji bîr kirin, ku hejmar bi hejmar zimanê wê xweş û sivik dibe. Lê, bi vê yekê re, hîn jî kêmâsi he. Ez dixwazim di vî warî de, di çar xalan (niqtan) de dîtinê xwe pêşkêş bikim.

1. Hinek hevalen nîşkar û xebatkar ji ber xwe ve bêjeyan (gotinan) çedîkin. Niha hewcedariya zimanê kurdi bi bêjeyen çêkirî tune ye. Heger hebe ji, divê ji kesen zimanzan, dezgeh û enstitûyen kolektîvî bêz avakirin û ew vî kar û barî bi cih bînin. Ez bawer im, ku dê di rojêne pêş de, ne kara van bêjan ji zimanê kurdi re hebin; lê dê zerara wan mezin bin. Edî bi salan mirov bike-neke dê nikaribe van bêjeyen çêkirî yên çewt, rast û paqîj bike. Ji van bêjeyen çêkirî re ez dikarim çend mînak bidim: Konevanî, pozberî, vebîrîn, tunekirin... Pozberî, gotineke çêkirî ye û tu maneya wê tune ye. Heval konevaniye di şûna politîkayê de bi kar tînin. Di kurmancî de, kone di mana kesê zikreş, fesad de ye. Soran di şûna bêjeyan 'politîkayê' de carnar bêjeyan 'ramyarî' bi kar tînin. Halbû ku ne bi tenê grûba zimanê Hind-Ewrûpayî, herwiha li tevayıya dînyayê ji %90 bêjeyan 'politîkî' tê bikaranîn. Gelo çîma em konevaniye çêbikin û ji %99.5 jî xelkê me jê fêm nekin, hem jî garantiya wê ya rastbûnê jî tune be. Ya din, li kesen politîkvan jî hegereteke mezin tê kirin. Ma ew zikreş, fesad û kuşpene ne?

2. Hinek bêjeyan jî çewt bi kar tînin. Wek karbdest, cinaze, dabeş...

3. Devokên herêmî gelek in. Wek, nuh, xwînî dihêne, xwiya... Ew nimûne, Ehmedê Xanî gotina "nû" di sala 1681 an de bi kar anîye. Navê pirtûka wî "Nûbar" e ku tê wateya mîweyê nû. Anglo bi tirkî turfande. Ya duyemîn, Dr. Kamuran Alî Bedirxan di sala 1943 an de bi navê Roja Nû kovarek derxistî bû. Li Stockholmê di sala 1990 an de bi Soranî rojnama Serdema Nû derket. Ji gotina "nû" ê gelek bêjeyen nû hatine çêkirin. Wek, nûçe, nûçegîhan, nûdem, nûjen, nûciwan... Lê, nizam çîma heval hîn jî bi nîşandina "nuh" dom dikin. Gelo dokument û argûmenten hevalan ji bo nîşandina "nuh" ê ci ne?

4. Di şûna bêjeyen (gotinê) kurmancî yên ku her roj xelk wan bi kar tîne de, yên soranî bi kar tînin. Wê demê xwendevan fêm nakin. Wek belam (lî), berz (bilind), şêwe (awa), xak (ax), zor (pirr-gelek)... Bikaranîna gotinê soranî baş e, lê hîn xwendevanî me nikarin kurmanciya rojane bixwînîn, em rabin û soranî bi kar bînin, ev ne rast e.

Malmîsanij

ZAZACA-TÜRKÇE SOZLÜK

FERHENGÊ DIMILKÎ-TIRKÎ

Mi wexto ki qerar da û mi va, ez derheqdê nê ferhengdê ma di cay çî binusa, ez gelek pejmîriyaya. Zaf çî amey mi vîrî. Heme çiyê ki amey mi vîrî ez nîşanî tiya dir binusa. Labelê ez do yew çî binusa. Edebiyatî ma Kirdano nuşte hema, hema kê şenî vajî çinî yo. Kitabî ki hetanî ewro bi zarava Kirdkî (Dimilkî) nusayî çî heyf ki vîst heban nîresenî. Eki ma

Ferhengê Dimilkî-Tirkî

Mewlidanê Mele Ehmedê Xasî û ey "Usman Efendi nîhesenî, çiye kî nusayî, pêrû zî nî davîst serrandê peyeyanî di nusayî. Helbet kî wexto ki nê haldê xwi ra ewnîyê pîzey kî, kî veşeno. Halbîkî çend mîlyon mîrdimî bi zarava Kirdkî qise keni. Hîzaran reyra Kirdkî mayê zanayey, intellektuelî estî. Ü zâfîney nînan Kirdkî zanî. Labelê nînusenî, nîwanenî û bindi xemi yînî zî niyo.

Tira pey mi pîzêdê xwi di va, "de baş o ki perû bê xem niyî, zaf tayn bi zî, ayê ki xwi nê karan ser o dejnenî zî estî." Vîst serî ra ver çiyekî çinî bi. Labelê ewre ehendey kitaban heti yew Ferhengê ma zî esto.

Kirdkî bi biyayışe yew ferhengî çiydo tay (kemî) niyo. Hadirekerdişê nê ferhengî (Ferhengê Dimilkî-Kirdkî/Zazaca-Türkçe Sözlük) zî asan nîyo. Verê heme çî zanayî lazim o. Labelê zanayî ra teber zî, sebir, xwibetalnayî, ziwan û şardî xwi ra heskerdiş zî lazim o. Helbet xebatê ki heyanî ewro amayî kerdîş, pêrû zî

Ziman bingeha neteweyekî ye

Gavan Koçer

Jiyana avahiya ziman bi dîroka mirovatiyê re dest pê dike. Ew mirovîn ku bi hev re li ser axekê jiyan, di domana dîrokê de ji xwe re zimanê hevpar çêkirine. Wan bi vî zimanî xwesi û nexweşiyen xwe anîne ser ziman, hisen xwe ji hev re şirove kirine, ji hev fam kirine, dost û neyaren xwe nas kirine, zarokên xwe hîn vî zimanî kirine. Ew bi vî awayî ji xwe re navdankekê (kimlik) hevpar anîne holê, bi vî navdankê ji avahîke civakî sazkirine. Di civat û dezgehîn wan de ziman bûye şiklê têgîhîstîn û kaniya netewemendiyê.

Navdank

gotineke ku salixa navdanka neteweyî, çandî, zimanî û kesanî dide û di psîkolojiyê de ji cih-kî gîring digire.

Em di axaftinê xwe de gellek caran deng û behsa qedexekirina ziman û navdankî dîrokê de ji holê rakirina Kurdan e. Ji bo vî jî mîtingehparêzî gellek azînîn (metodîn) cuda û hov afirandin û bi wan jî dûrahiyê mezin gitte. Jiyana me Kurdan iro di berçavan de ye. Ew rengîn ku Kurd iro tê de ne, ne yên wan in. Ew ji hebûna xwe fedî dîkin. Ji xwe re bûne biyânî. Ji xwe direvin, naxwazin xwe nasbikin, di mîja xwe de dîldarî derivandîne. Pirraniya wan xwe bi buhatîye erzan difroşin. Gelo sedem ci ye ku iro di nav Kurdan de bi hezaran parêzger (korucu) derdikevin? Serokên komara Tirkan herroj ji perçiqandina Kurdan, bi gulebaranî balafiran ji holê rakirina wan behs dikin. Dibêjin: "ew herin asimanê jî em wan bernadin".

Bûgûman ger mirov şexsiyeta geleki bişkîne û wî bizdîne, wê çaxê ew gel ji nirxen xwe yên zîmkâkî bêbingeh dibe û bi listina wî jî hêsanter dibe. Nexusim, di dîroka mirovatiyê de ew neteweyen ku zimanê xwe winda kirine, ji holê rabûne, ketine navrûpelîn dîrokê û edî cardin jî deng û behsa wan nehatiye kirin. Neteweyen wilo ne kêm in.

Ger heta iro zimanê kurdi hatîye qedexekirin, baş tê zanîn ku sedema vê di dîrokê de ji holê rakirina Kurdan e. Ji bo vê jî mîtingehparêzî gellek azînîn (metodîn) cuda û hov afirandin û bi wan jî dûrahiyê mezin gitte

"Kurd ên rewşenbîr" li hundir û derveyê welat ji bo rejimê çepikan lê dixin. Hêviya wan ew e ku ka rejim kengê têkoşîna rizgarîxwaz xilas dike.

Encama vê jî belavbûna kesitiya Kurdan û civata wan e. Bingehe vê a mezintirîn jî ji zimanekî neteweyî dûrketin e.

Di domana iroyîn de gelê Kurd di bin serokatiyeke rast de dest bi redandina biyanîtiyê kirîye. Redandina biyanîtiyê, destpêkirina xwe nasiyeye. Ew hîdî hîdî qafika mîjokdariyê dijetîne û dikeve rengeke nuh. Kesitiya iroyîn li ser erkîn serbiyxwe bilind dibe û mîzgîna serfirazî û şarezayîke nuh di. de. Ji 7 an heta 70 an di bin serokatiya yek pêşenget de dixwazin bibin reng û şeweyek. Anglo rengîn gelêni bi konevaniyeke nuh şîn dibin.

Lê divê gelê kurd dev ji pêşveçûna zimanê xwe yê zîmaki bernede. Divê ew jî bi konevaniye ve here. Weki me li jor jî got ziman kaniya netewemendiyî ye. Bê ziman kesitiyeke bi rûmet çenabe. Hisen gelêni li ser zimanê zîmkâkî bilind di bin, baweriya mirovan bi vê qeydê pêk tê. Civateke bi nix (qîmet) û çelebi wiha çedîbe. Ger em bixwazin civateke bi bir û bawerî ji bo xwe û zarokên xwe sazbikin, zarokên xwe ji helandina çanda biyaniyan xilasbikin, divê em ji iro sun ve dev ji hînbûna zimanê dagîkeran berdin û xwe û zarokên xwe hîn zimanê xwe yê zîmkâkî bilind.

Weke serok dibêje: "Me di qonaxa yekemîn de di ruhê xwe de mîjokdarî perçekir". Werin gelê Kurd em wê bi zimanê zîmkâkî bidomînîn da ku pêşerojîn me bi gul û kulîkîn azadiyeke giranbuha werin neqîsandin.

mardey keliman û vatan biko.

Malmîsanij, neyrey û maykey keliman ferhengî di newa. Labelê hezey telefuzandê keliman û vatan, neyrey û maykey keliman zî gore bêcayan bedelyenî. Inay ser o Malmîsanij vano: "Enasar kelimay kam ca ra ki giyriyayê bi hewa bê ay cay nudîsiyay. Yanî eke kelimâa ay ca di nejî, mayki ya maykî nusiyî."

Ferheng hetey izehandê keliman ra çirray cay çinî yo. Kelimay bi hewawo zelal izeh biyî.

Hadirekerdoxê ferhengî, nîvato na kelimâa koki yay Erebî, Tirkî ya zî Fariskî ya, herçî yey kelimaya ki Dimilkî di vajîna ferhengî di ca dawo bere. Kê inay bizanî rind o, nê ferhengî di, fiîli bi formê mastarı ameyî nuşîş.

Malmîsanij bi hadrekeriye nê ferhengî, no ware di yew gama gird eyşa. Semedo ki no ka tiya dir nêmâno ganî ma se kî? A verêni, ganî no ferheng berzîndê hergû roşanbîrî Kirdî di bibo. A diyini ganî roşanbîrî ma na gama erjiyaya ebi xebatidey xwi, hina ave berîl..

Adresê xwestinê: Weşanîn Jîna Nû Box 24012, 75024 Uppsala/Sweden J. Esper

weziyete zarava Kirdkî biyare xwi çiman ve, îmkan çinî yo ki yew merdim xwiser bişo bindê nébarî ra vejo û heme vatan û keliman banco pêser. Kişta bîn ra na xebati şertandê normalan di nêbîya. Dewleti timi herîş kerdî karandê anasaranan. Vatisê vernî di Malmîsanij behsê na çetiney keno û vano: "No beynartar di polisê Tirkî ra nîmitîşî ver, des hezari ra vişer kelimayê ki mi pêser kerdbî, vîndî bîy. Hergû ray ez mecbur mendî di mi newe re dest pey kerd"

Edet o, nusenî vanî no ferheng ehendey keliman û vatan ra amewo meydân. Nê ferhengî di çîyo anasaranî çinî yo. Ma nêzânî hetey keliman û vatan ra kapasitey ferhengî çîya. Ma nîşanî yew homar bîdi. Labelê ferheng 431 ripperî yo. Ez bawer kemo homarê ripperan derheqdê kapasitadey ferhengî di yew fikir dano kî. Ferheng, yew heti ra ferhengî şîwandê Dimilkî yo. Malmîsanij ca dawo şîwandê ciyayan. Aw semed ra zî zaf zehmet o ki kes behsê ho-

Jine şâîrî Kurd û dîrokñas

M
E
S
T
Ü
R
E
Y



K
U
R
D
I
S
T
A
N
Î

(Soranî)

Gelî Kurdiş wek her gelêkî tîrî ser rûy zemîn xawenî gelêk le nawdaran û şâîran û zayan bûwe. Yekêk lemane şâîr û mêtûnasî benawbang û "Mestûrey Kurdistanî" bûwe.

Mestûre Mahşerefxanî kiçî Ebûl Hesen Beg kurdî Mihemed Axa, kiçî Mamî "Sadîq Elmûlk" e, û hawserî "pî-reki" Xusrewxanî Nakam, Walî bajêri "Sine" ye. Le hozî benawbangî. Qadîrî "ye, le saflı 1229" koçî 1814 "zayînî" le şarî Sine le dayik bûwe. Le saflı 1264 "koçî" 1849 "zayînî" le şarî silêmanî be nexoşî rişanewe, le temenêkî kurtda le dinya derçûwe.

Reza Qulîxanî Hîdayet le barey Mestûre delê: "Mestûrey Kurdistanî le jine necîbe benawbangekane. Xoşnûsêkî destrengîn û behrew jinêkî ciwan û şox û dawêne pakî rewîst merdane bûwe. Dîwanî şîerekânî Mestûre lejîr nawî "Dîwan" le saflı 1926 bilaw kirawete-we. Mestûre nizîkey 20000 beyte şîerî le paş cê mawe. Herweha kitêbekî tîrî nûsîwe be nawî "Mêtûrey Erdelan" be zimanî farsî. Em pertûke le saflı 1989 be zimanî Kurdi "Soranî" le Kurdistanî Başûr bilaw kirawete-we.

Ewey şayanî base nirxî na-sînî Mestûre û nûsînekanî le-we daxe ke le seretax sedey 19 hemda jinan tenanet le Ewrupaşa maffî diyari kirawan be xoyanewe nedîtbû û

bigre şorişî meznî Ferensaş ke le mêtûrey cîhan û be taybet le mêtûrey Ewrupada karêkî gewrey kirdûwete ser jiyanî koelayetî û ramiyarî mafekî ewtay bo jin diyari nekird. Tenanet "Napilyon" iş ke be dakokîkerî maffî jinan dadenre le yadaştekanî, ke le Sant Hêlane nûsîwnî bem core derbarey jin dedwê: "Boye jinim be piyaw bexşî ta be berî bêne, her weku darî be ber mulkî baxewane jînîş mulkî piyawî." le katêkda eme barudoxî maffî jinan bûbê le Ewrupada ey le rojhelatî musilmanetî ebê çon bûbê?

Béguman le sakartîn maffî mirovayetî bêbeşbûn û le çi-warçêwey dîswarî malda zincirî nerîfî koneperistaney komeleyetî be dest û pêyanewe alabû, lem çerxeda le şarêkî muhafazekarî Kurd da ke şarî "Sine" ye, jine xwêndewarê wek mestûre helkewê ke nawî şâîrî û nûserî le hemû wilate-kanda deng bidatewe cêy şanaziye bo ew mîlletey ke Mestûrey le dawênda perwe-rand û we, le lapereyekî zêrîna nawî legel biwêjan û nûseran û edîbanî payeberzî Kurd da le mêtûrey edebî kur dîda tomar bikrê.

Herçende Mestûrey Kurdistanî temenêkî kurt jiya, belam dîsanîs naw û nawbangî her mawin û zindûn. Le rastîda gelî Kurd serbilinde be yekêkî wek ew.

Le kotayî em baseda parçê Mestûrey Kurdistanî

pêşkeşî xwêneranî hêjay roj-namey "Welat" dekeyin:

Giriftarim be nazî çawekanî mestî fetxanit

Birindarim be xemzey herdû çaw û tîrî mujganit

Be talî perçemî egrîçekanit xaretit kirdim

Dilêkim bû ewîst xiste naw çahî zenexdanit

Minîş hatim bîfermû bim-kujin bimken be qurbanit

Teşekkur wacibe bo min eger bîrim be zexmî to

Be şertî kifnekem bidûrî be tay zulfi perêşanit

Le kuştin gerdinit azad de-kem xo bêye ser qebrim

Ke rojî cuma bîmnîjî lelay heşir zehmetî naden

Eger wek min le em ûnî-yaye sûtâbê le hîcra nit

Hemîşe sucdeghîm xakî ber derganekey toye

Reqîb rûrêş bê çûn nalê bi-ga destim be damanit

Dîlim meşkîne çunku mex-zenî derd û xemî toye

Fîday şert û wefaket çî be-ser hat meylî caranit

Eto emro le mulkî dil-berêda nadîrey dehrî

Be resmî bendegî "Mestûre" wa hatote dîwanit

Têbîni Bo em nûsîne sûd lem dû serçawê wergîrawe:

1- Mêtûrey Erdelan, çapî ye-kem 1989.

2- Govarî Swêdî "Svensk-kurdisk Journal", jimare 15-16, hawînî 1989.

Mehabat Kurdî

AZADÎ

Abdurahman Durre



Dilxilt

Dev muslimanî dil gawur, dev yarê dil neyar, dev xweşê dil xilt, dev sosyalistî dil kemalistî gotinê wekî wan ku ji mirovîn sextekar û durû re bêne gotin wê pir di cihê xwe de bin.

Di rojnama Milliyetê de (7.6.1992) nîvisareke wiha li ber çavê min ket: "Avrupanın Türkiye hakkında çarpık raporu." Dîqeta min kişand, min bala xwe dayê ku sosyal demokratî me yê namîdar 'İsmail Cem' dibêje: "Gere em Ewrûpa protesto bîkin (berbirê wan derên), ew çawa navê Kurdistanî tînin ser zimanê xwe û behsa mafêne Kurdistan dikin. Wiha 'didomîne': 'Kurdistan diye bir yer yok, Kürt hakkı ve özgürlüğü onlara mı kalmış.' Min rind bala xwe dayê ku Ewrûpa dibêje: 'Kurd û Kurdistan lê zilm, zor û işkence dibe, divê ku van tiştan edî nebin, mafêne Kurdistan yên demokrasî û insanî bêne dayîn; Kurd jî weke hemû gelên dînyayê bin."

Bu rastî jî insaniyetî û demokrasî jî wilo divê, wilo dixwaze, belê ci mixabin e ku dev muslimanî dil gawur, dev sosyalistî dil kemalist, an jî gotin durust be dev çepen dil xilt, sextekaren dev bi zirt, jî insaniyetî û demokrasiye fêm nakin. Wilo bê his û bê mentiq in ku ji bo 30-40 hezar Tirkê Qibrîsê federasyon dixwazin û mafêne 30-40 milyon Kurd jî inkar dikin, ji navê Kurdistanî ditirsin û dienirin.

Bu rastî ew ne bê his û nezan in, irraqî û hovê tûran in. Pirr qenc û baş dizanîn ku Kurdistan heye û li nav Tirk, Ereb û Ecem hatîye parçekirin, di binê zilm, zor, cerd û talanen wan de wêran bûye. Heta niha digotin Kurd tune ne, niha jî dibenî Kurd hene belê Kurdistan tune ye. Ez ji wan hovê bê mejî re dibêjim ku şerm û fedî bîkin, bese bîvin pêkenînen dînyayê, Çawa Kurd he-ne çawa Kurdistan tune ye, Kurdistan yanî cih, war û meskenê Kurdistan, herweki Qirixîstan, Tatarîstan, Moxolîstan û Hovîstan, ku cih war û meskenê Qirix, Tatar, Moxol û hovan e.

Ez ci ji we re bêjim, belkî piçek his û mejîye we jî hebe, xwedê ew jî ji we bistîne, hûn rind bibin pêkenînen alamê.

Dîvî ku em vê rastiyê jî kifş bîkin, ev bê insafî, bê hisî û bê mentiqiya ku hûn dikin ji hemû gelê Tirk re nabe mal. Em gelê bê guneh û paqîji vê mêtî zengariya we û qirêjayıya we tenzîh dikin. Lewra xelk weke dahl û daristana ne. Di dahlan de teba û hov, hirç û gur, çeqel û leşxwer jî hene, şer, piling, pezkûvî, xezal kew, qumrî û bazî jî hene, gul jî hene dirik jî hene. Lî belê gotinîk pêşîyan e dibêje: "Çelekek rôxoke navê garana gundekî xirab dike." Heta kemalistî û kelmistî mîna we bê his û bê mentiq hebin, gelê Kurd û Tirk hêsan nabin, wê ji destê we pirr bikşîn. Heviya min ew e ku xwedê zû rihe we bistîne û pêşîra me ji destê we xelas bike.

Ma kurro; hûn qe fedî jî nakin, qe biaqilekî demokrat û huma-nîstekî di nav we de tune û ji we ranabe? Ev ci avtêz e bi ser we de hatîye? Erê yên wekî çavzexelê Yûgoslav (Kenan Evren) û gurê pîr (Türkçe) esker in, ji dîrok, demokrasî û mirovayetî tîştek fêm nakin û nizanîn. Lewre hemû jîna wan di "hazir ol, rahat, buyurun qumandanîm" de derbas bûye, mêtîyên wan zengarı û cilq bûye. Lî belê hûn yên ku di demekî de we doza çepîti, sosyalistî û sosyal demokratiye dikir, ev li we ci hatîye? Hûn qe nafikirin, hûn qe li dînyayê mêtî nakin? Hemû tiş hatine guhestin, hûn hê ji "eski tas eski hamam" serhiş û mêtî zengarı mane. Kî dizane, belkî jî hûn xwe li ser heqiyê dizanîn û me neheq dibîn. Ez texmîn nakim ku hûn ewqas jî bê his bin, hûn dilxiltê mêtî genî ne, kemalistî tûranî ne, mejî zengariye sextekar in. Em ji we re û ji yên wekî we re dibêjim bîvin insan û merî, nebin gurên nav kerî..!

Qenc bizanîn û fêm bîkin, ku êdî hûn bi van vir û derewen bê tam û bê xwê, bi van dek û dolaban û bi hileyen durutî nikarin tu xeltê bîkin, hişen xwe bînin serê xwe, gelî kelmista... Nizanîm gelo we seh kir?..

Jan Dost
KELA DİMDİMË

Weşanîn Melsa

Navîşan: Piyer Loti Cad. No: 85/2
Çemberlitaş / İSTANBUL

Tel: 516 72 01

KURDISTAN

Firehiya xaka Kurdistanê 520.000 km² ye. 25 milyon kes li axa Kurdistanê dijin. Bajarê Kurdistan yên herî mezin ev in: Musil 1.200.000, Kermansah 580.000, Dilük (antep) 600.000, Amed 400.000, Urmiye 350.000

Çemên mezin li Kurdistanê, Ferad 2.800 km, Dicle 1.900 km û Murad 722 km. in. Çiyayê herî berz û bi nav û deng ev in: Agirî (Ararat) 5.167 mt, Cilo 4.116 mt, Sipan 4.058 mt.


Dîroknaşê cîhanê û yên Kurdan li gorî ku dane xwîyanîkirin, Kurd zaroyen Med'an in û ew Arî nin. Berî ku Isa pêxember ji dayika xwe bibe bi 1000 salî, ew di navbeyna çiyayê Zagros, li dora Wan û hetanî Urmiyê diman. Di sala 612 (Bî) de bi Persan re bûne yek û zora împaratoriya Aşuriyan birin. Lewmaye ku her Newroz, Kurd ji xwe re rojekî mîna xelasbûnê dinasin. Di wê rojê de jî Kurd, rizgar bûbûn.

Piştî ji dayikbûna Îsa împaratoriya Roma tê Kurdistanê û Rojhilata navîn dagîr dike. Li vir şerî di navbeyna Roma û Sasaniyan de dest pê di-

BEXÇEYE ZAROKAN

Niştimana xwe binas

BERHEVKIRİN: GABAR CİYAN-MEHABAT KURDİ



ke. Ev şer hetanî sala 620 an dom dike. Jê û pê de Ereb têne holê û gellek deveran dagîr dikin. Şer vê carê di navbeyna Ereb (Abbasî) û Bîzansiyen de derdikeve û Kurd jî jê fêde dikin, dewleta Mervaniyan ya Kurdan

çedîkin. Piştî Tirk têne derdixe û Kurdan bi Osnavçê. Dûvre împaratoriya Osmanîyan ava dikin. di navbeyna safawî (fars) Osmanî dixwazin Kurdan û Osmanîyan de (Tirk) têxine bin hukmê xwe, lê dest pê dike û bi peyma-Kurd qebûl nakin, lê xâna Qesrî Şîrîn li hevdu yinê mezin yê Kurdan İdrîsî Bedlîsî bi fen û dola- ban eşiretên Kurdan ji rê

Di sedsala 19 an de Fransewî, Rusî û İngilîzî

MARŞA XWE BINAS

Ey reqîb

Ey reqîb her maye qewmê Kurd ziman
Naşikê danayê topêن zaman

Kes nebê Kurd dimirin

Kurd jî jîn divêñ

Jîn dibe qed nakeve

Ala Kurdan

Em xortê medya û keyxusrew in
Seyr bike xwîna diyan me da rijand

Kes nebê Kurd dimirin

Kurd jî jîn divêñ

Jîn dibe qed nakeve

Ala Kurdan

Em xortê rengê sor û şoresh in
De bi xwîn neqşîn bikin tacâ cîhan

Kes nebê Kurd dimirin

Kurd jî jîn divêñ

Jîn dibe qed nakeve

Ala Kurdan

Lawêñ Kurd rabûn ser xwe wek şeran
Dîn iman ayîn iman Kurd û Kurdistan

Kes nebê Kurd dimirin

Kurd jî jîn divêñ

Jîn dibe qed nakeve

Ala Kurdan

Lawêñ Kurd tev hazir û amade ne
Can fidane can fida tev can fida

Kes nebê Kurd dimirin

Kurd jî jîn divêñ

Jîn dibe qed nakeve

Ala Kurdan

Berhem:Dildar (Başûrê Kurdistan 1918-1948)



WELATEN CIHANE BINAS

Etopya

42 milyon kes li Etopyayê dijin. Paytexta wê Addis Abeba ye. Ji ber sedemêñ ku ev welat heya sedsala 19 an ji teref Ewrûpiya hatibû dagîkirin û piştî ji rizgar bû, lê rejimêñ li ser kar diktator bûn û kar ji bo berjewen-diyen gelê xwe ne dikirin, Etopya feqir ma. Ji gellek aliyan weke welat bi pêş ne ket. Lê berî niha bi salekê, grûbêñ şoreshger bi şerî çekdarî bi ser ketin û hatin ser hukim. Niha li wir hinek kar tê kirin, lê gel hîn jî hejar e, mecalen tenduristî kêmîn; ji ber wiyo jî mirov dimrin.

Gel li wir idara xwe bi çandîn û xwedîkirina pez û hatina behre dikin.

HEYWANEN WELATE XWE BINAS


Pezkovî

Pezkoviyyen li Kurdistanê belek belekî nin. Dirêjbûna wan ji erdê 1 mt. heye. Pirr bi göst in. Giraniya wan nêzî 100-150 kg. heye.

Pezkoviyyen li Kurdistanê pirr hez ji hêşinayıyê dikin. Her wiha fêkî ji dixwin. Emrê pezkoviyan pirr dirêj e. Ew 20-25 salan di-jîn.



Kêroşk (Kêrgo)



Kêrgoyen ku li Kurdistanê dijin belek belekî ne û sipî ne. Dirojbûna wan 40 cm. heye. Nêzî 3.5 - 4 kg gi-ran in. Ew pirr hez ji hêşinayıyê dikin. Emrê wan 10-12 sal dirêj e.

Kêroşk (Kêrgo)

tê navçê û dikevin xaka Kurdistan, ji bo ku li xwe pay kin. Kurd li hemberî wan gellek şerîn mîna Rewanduz, Ubeydullah kirin; lê dagîkeran bi peymana Lozanê (1923) Kurdistan di navbeyna çar welatan de bes kirin. Di navbeyna salêñ 1924 û '40 an de gellek şerîn Kurdan ji bo xelasbûnê çêbûn, weke şêx Seîd, Dersim û hwd. Lê Kurd bi ser neketin. Piştî li başûrê Kurdistan di navbeyna salêñ 1961 heta 1935 an şer çêbû. Lê ev şer ne ji bo xelasbûna tevayî bû. Ji bo daxwazê heqê kulturî, ziman û hwd. bû.

Di sala 1978 de PKK (Partiya Karkerê Kurdistan) ava bû. Li ser bingehê serxwebûn û azadiya Kurdistan ava bû. Ji salêñ 1980 heta niha li zindanan gellek Berxwedanê bi nirx ji teref endamên wan ve hatin kirin. Ji sala 1984 an vir ve, bi gerillayê ARGK (Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan) şerî çekdarî dest pê kiriye û niha dikin ku artêşa neteweyî damezirînin. PKK biryarek dîrokî daye ku, ji niha û nêz de parlementoya neteweyî ava bike. Ev jî mizginiyek pirr xweş e ji bo tevayê Kurdan.

Rastî nayen veşartin

Destpêk rûpel 1

li gundê Nirweh û Billehê 10 gundiyan sivil kuştin. ERNK, di dawiya belavoka xwe de wiha dibêje: "Livbaziyan wiha wê di dema pêş de firehtir û xwirttir bibin. Ji hêla takîkên leşkerî ve girîng e ku bargehêne dijimin werin ruxandin û îmha kirin. Ji aliye siyasi ve jî ev operasyon, dide diyar kirin ku qetîsamên dewleta Tirk, bê bersiv namînin."

ROJEVA WELÊT

Xelata Ataturk tijî xwîn e

Destpêk rûpel 1

Dest bi dijmîn û heqaretan kirin. Sernivîskarekî wan digot "ji xwe Mandela terorist e. Rojnamevanekî wan dinivîsand "Mandelayê reşikê pîsik" çendîn din ji digotin "Ma ji xwe ew ê cemreş ne layiqê xelata Ataturk e."

Serokê mehkema qanûna bingehî (Anayasa mahkemesi başkanı) Yekta Güngör Özden ji digot: "Nelson Mandela teroristeki kevn e û hatîye xapandin (xwedê kirîye Mandela ne li Tirkîye ye, ne xwe, Yekta wê iro disa ew bisanda zîndanê) bi kurtî, ew durûyen ku berî heftekî pêsnê Mandela didan, bi redkirina xelat re naletê lê barandin.

Kemalistan ji bi awayekî nermtir û sînsitir li ser vê meselê nivisin. Li gor dîtina wan, zemanek Kenan Evren ev xelat girtibû, û navê vê xelatê herimî bû, ji ber vê yekê Mandela ev xelat qebûl nekiribû û heqê wi ji hebû, yanê Kemalistan heq didanê.

Çawa ku tu kîmasyen demokrasiya Tirkîye ji Kenan Evren pêştiş tune be. Li gor mejîye war, ku Kenan Evren ev xelat ne herimandibûya wê Mandela çawa xelata vê dewleta demokratik red bikira? Inca xelata Ataturk!

Meseleyek heye: Dibêjin rojek zivistanê nêçîrvanek leqayê kewekî tê, dîsekinê û jê dipirse "Çima tilikîn te sor in?" Kew dibêje "Ji berfî ye" Nêçîrvan ji dibêje, "derew meke lawo, ê ne min havînê ji tiliyen te ditibûn, disa sor bûn."

Erê, di dema cuntaya Kenan Evren de gellek mirov di işkencexanan de hatin kuştin û mafîn mirovan li her derê hatin îhlâkîn û hwd.

Lê di wan demen dî de ji rûyê dewleta Tirk têra xwe reş dixweyi. Ne beri Evren ne ji pişti wî tu car demokrasî ne ketiye Tirkîye û tu car mirovân pêşverû ji işkencexanan xelas nebûne.

Ew Kemalistan ku dibêjin xelata Ataturk ne layiqê Evren e, layiqê Mandela ye, ma Dêrsim nayê bîra wan?

Gelo, qetîamân Agiri, Zilan, Amedê û Sason qet nebihîsine? Ew ne Ataturkê we bû ku bi hezaran jînen bi hemîl, pîrîn bi gopal û zarakîn dergûşan dida kuştin û dişewitandin? Ma ew ne qîza wî ya manewî bû ku belengazên Dersimê bi balafira xwe bombebaran dikir û pesnê xwe ji Ataturk re dida? Gelo imkan heye ku dîroka mirovahîye van qetîamân ji bî bike.

Pişti ku Mandela ev xelat redkir Demirel û İnönü ji wek Kemalistan nijadperest, suc tev xistin ser Kenan Evren.

Belê, qet şik tê de tune, Evren xwînmij e, hov e û dijmînê mirovahîye ye. Lé bi sucavâtina ser Evren ew nikarin xwe paqî bikin; paqî nabîn. Gelo gava li Qulp û Licê 3 hezar insan li ser berfî bi saetan hatin direjîkirin û 30 kes ji wan hatin qetîkirin hingê serokwezir ki bû? Kenan Evren bû, an Demirel û İnönü yê xwînmij bûn? Ewê ku ji bo xeniqandina Deniz Gezmîş, Yusuf Aslan û Hüseyîn İhan qanûnekî nuh derxist ki bû?

Mesûlê 103 zarok û jînen di Newroza ışal de hatin qetîkirin Evren e an Silêmanê xwînxwar e? Ji xort û qizîn me yên di zîndan û nezaret-xanan de û ji qetîamân her roj li Kurdistanê çedîbin ki berpirsiyar e? Ataturk, Evren, Demirel an ji Ecevit?

Qet me nexapînin, xwe ji nexapînin. Hûn giş mesûl in, hûn giş xwînmij in û édi em baş dibinin.

Na, hûn édi nikarin kesî bixapînin. Ne Mandela ne ji kesekî din bi xelatîn we nema têx xapandin. Navê diktatora ji bi xelatan paqî nabe. Hemû dinya baş dizane ku Ataturkê xwînxwar û Kurduj di nijadperestî de Mamosteyê Hitler û Mussoloni bû.

Edî hûn nikarin bi xelatan eybîn xwe bîveserîn û navê faşîzmî deyîn "aşî!"

En ku rastiyê nexwazin bibînin û jê birevin, ew ji destê rastiyê xelas nabin. Dê rastî rojek were bi qirika wan bigire. İro tékoşina gelê Kurd bûye rastî, û dest avetiye pêşîra faşîzmî û dagîrkeriyê.

Gelê Kurd di bin pêşengîya partiya xwe de roj bi roj xwirttir dibe, û dengê tékoşina xwe ya neteweyî digihîjîne hemû derenî dînyayê.

En ku di qetîamân Dersimê de haya wan ji gelê Kurd tunebûn, iro dörfîrbuna berxwedan û serhîdanenîne keli bi keli dibînin û li peyten. Gelên din ên bindest ji vê tékoşînê vînam distînîn, li ber xwe didin û li hember emperyalîzmî dibîn yek, wek kumek.

Dewlet dixwaze...

Destpêk rûpel 1

di vê dema dawiyê de durûtiya dewletê baş hate es-kerekirin.

Di derbarê van livbazî û êrîşan de Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistan-Rêxistina Ewrûpa, di roja 13'ê Gulanê de belavokek pêşkêşî awira gelempêrî kir. Belavok vê pîrsî wiha şirovedike:

"Hêzên dewletê; di dema Newrozê de diyar bû ku nikarin xwe li hemberê pêşveçûnê ku li Kurdistanê

tanê çedîbin bigirin, wisa ji gerillayê Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan (ARGK) lêdanê mirinê anîn ser artêşa dewletê ya dagîrker. Ji ber van pêşveçûnê şoreşgerî, dewletê berê xwe da welatparêzên sivil û dest bi qirkirina wan kir. Armanca dewletê ji van êrîşen bê qeyd û zagon ew e ku gelê me bitirsîne û ji tevgera rizgariya neteweya Kurdistan biqetîne. Li hêlekê artêşa dewletê ya fermî û li hêla din kontrayê bi navê Hizbullah (Hizbî-Kontra), hinek eşkere û hinek ji bi dizî şerê qirkirinê li dijî me didin meşandin..."

Belavok hinde bûyerên ku di mehîn Nîsan û Gulanê de bi desten dewletê hatine çekirin eşkere dike. Heya dawiyê hovîtî û nemirovahîya ku li tu deran nehatîye çekirin ev e dewleta koalîsyonê ya dilovan, ku şefqetê ji bo Kurda dixwaze dike.

"Bi taybetî di meha Nîsan û Gulanê de dewletê êrîşen xwe yên li ser gundiyan zêdetir kir. Gelek welat-parêz girtin, di meydanê

gundan de li nîvê rojê kuştin, lêdan eşkere li gundiyan kirin, mal talan kirin, namûs riswa kirin... ziyane-ke gelekî mezîn dane gundiyan. Ev bûyer bi giranî li gundê Amedê, Stewrê, Cizîra Botan... û hwd. hatine pîkanîn.

Dewlet rê li gundiyan di-gire, bi hiceta kuştina şoreşgerên ARGK şivanê sivil dikuje û dibêje me terorist kuştin. Dewlet bûyerên wiha ne tenê li Kurdistanê çedîke, li Tirkîye ji bi navê gerillayê ARGK livbaziyan wiha çedîke, armanca wê jê ew e ku şovenîzmî di navbera Kurdan û Tirkan de xwirt bike. Wisa li Ewrûpa ji vê teror û şovenîzma xwe didomîne û bi hezaran kesen Tirk li dijî biratiya gelê Kurd û gelê Tirk derbasî meşeke şovenîst dike..."

Li dawîya belavokê berpîsiyariya ERNK da xwiyakirin ku gerillayê ARGK ji navenda Kurdistan êrîşan dibin ser hêzên dewletê, ne ji Bekaayê: "Ev e em ji Bekaayê derketin, lê belê em di Bekaayê de

gîhiştine armanca xwe, me bi dehhezaran şoreşger jê derxistin, Bekaayê roleke dîrokî list. Me tu caran ji negotiye ku Bekaayê roleke me yê navendî ye. Serokatiya Eniya me ji di 1990 an de xwiyakiribû ku emê êdi berê navenda xwe bidin welet, her çar perçeyen Kurdistanê ji bo me akademî û navendê şoreşgerî ne. Wê ji niha û sün ve dewlet ci hîcet û behaneyen derxe..."

Belavok bi vî awahî dawî pê tê:

"Heya niha em bi xwirtî meşîyan emê ji niha û pê ve hîn xwirttir bimeşin, ev e me ji tunebûnê xwe gihande vê radeyê, em gihiştin merheleyeke wiha ku em Meclîsa xwe ya Neteweyî ava bîkin. Çawa ku heyâ niha dewletê nikaribû şerê me yê neteweyî bide sekinandin, disa ji emê biserkevin û wê dewlet bizanibe ku tu hêz nikare li hemberê şerê me yê mafdar bisekine..."

*Nasir Cuşkun
(Almanya-Welat)*



Bernameya televizyonê ya roja 32 an bala gel kişand

Rojnamevanê Tirk gellek caran bi sekreterê giştî yê PKK ê Abdullah Öcalan re hevpeyîn kirin û gellek hevpeyînan jî kişandine kamerayê. Lê van filman nikarin ku di televizyonê Tirkîye de belav bikin. Ev cara yekemîn e ku hevpeyîn a bi A. Öcalan re di televizyonê Tirkan de tê weşandin. Ev bernameya ku M.Ali Birand amade kiribû di 18'ê Gulanê de li kanala Şovê hat weşandin.

Him hîlwesta (tawir) amade karê bernameyê û him ji kanala televizyonê, vê bernameyê bi şeweyeke objektiv weneşandin. Ji bernameyê gellek tişt hatibû derxistin û gellek tişt ji hatibû berevajî kirin. Ji xwe armanca weşandinâ vê bernameyê tenê ji bo

bîçûkxistina A.Öcalan bû. Ev bûyer bixwe, sextekariyeke mezin e. Anku him amade karê bernameyê him ji televizyonê Tirk, sextekariya xwe pêşkêşî gel kirin. Lê tevî van hemû tiştan bermame gellek

Li Kurdistanâ Başûr hilbijartîn

Destpêk rûpel 1

Li aliye din, pêşmergeyên PDK ê ji dibêjin 700 gerilayê PKK ê besdare hilbijartîn bûne û rayen xwe da-ne YNK ê.

Li ser van gotin û gazinan li ser îptalbûna hilbijartînê rojnamevanê AA. Dîtina Celal Talebanî dipirsin. Talebanî dibêje: "İptalkirina

bala gel kişand. Bi taybetî ji bi milyonan mirovân Kurd ji bo mîzekirina vê bernameyê li malen xwe û li qehwexanan runiştin ber televizyonan.

la bibe ne mewzû bahîs e. Em hewl didin xwe ku yekîtiyê pêk bînin."


Heta niha, li herêma Behdînanê PDK di pêş de ye, li herêma Silêmaniye ji YNK li pêş e.

Di hilbijartînê de gellek berpirsiyar û mesûlen enter-nasyonal û mebûsên Tirkîye ji amade bûn.

Bi vê hilbijartînê wê parlementoya herêma otonom bê damezrandin.

Ressam Suleyman Danişman, li ser huner dîtinê xwe diyar dike:

'Huner bi têkoşîna gel ve girêdayî ye'



Suleyman Danişman

Ressam Suleyman Danişman: "Huner bi jiyana gel ve divê girêdayî be. Lewre tenê dikare bi vî awayî xwe li piya bigire. Lewre hunermend û huner ji ci celebî dibe bila bibe bi çanda jiyana gel ve ye. Anku hunera gel ew e ku xwe ji pêvajoya têkoşînê dûr nexe"

Ji kerema xwe re hûn dikarin bi kurtasî xwe bidin nasîn?

-Di sala 1948 an de li bajarê Mazra (Elezîz) yê, li gundê Çaganê ez hatim dinyayê. Min xwendegaha navîn û lîseyê li bajarê Elazîzê xwend, dawî li İstenbolê At. Egt. ê beşa wêne (resim) ê qedand.

We kîngê dest bi çêkirina wêneyan kir, tiştîn ku hûn da-fandin çêkirina wêneyan û li ser we tesîr dikirin ci bûn?

-Bi dil û can ku min dest bi mamostatiyê kir, min wêne (resim) çêkirin. Lî min vê yekê ji ji bîrnedikir ku mirov bikaribe bi serketinî wêneyan çêke, divê mirov perwerdeyeke bibîne. Ez dibêjîm qey ev raman bû ku min defande perwerdehiya beşa wêneyan. Pişti qedandina dibis-

tanê demeke dirêj min çêkirina wêneyan domand. Min li ba xwe tim vê yekê digot: "Divê ku zilm û zordariya salen heştêyan di wêneyan de bê neqşandin. Lewre divê di her qada jiyanê de mirov bi navgînên cûr be cûr doz û têkoşîna xwe bidomîne. Di tevâhiya jiyanê de hewcedarî bi tiştîn li ber çavan jî û bi rûcîk û pêjna hevparîtiyê ji heye. Ev qada huneriyyê mirov nikare bişemirine (biterikîne) û bi tenê bihêle. Ez bi kurtasî dikarim van sedeman bihejmîrim.

Gelo hûn di derheqê hunera kurdi de ci difikirin?

-Em dikarim wêneya Kurdi li du beşan parave bikin.

a. Dema nûjen ku di wêneyan de hebûna Neteweyî, nasname û şerî Neteweyî bi aqtifi û bi zanebûnî têde tê dîtin.

b. Wêneya Kurdi ya di doman û qonaxa dîrokî de. Ev jî ji dema şekftan ta iro hunera wêneya Kurdi ye. Ev mijar (babet) jî mîna mijarîn din (dîrok, arkeoloji) pirsgirêkek ku bête ronikirin. Bi

xebatên ferdi hinek hatine ronikirin, lê dîsa gotina dawî divê sazgehîn zanistî bibêjin. Di rojên pêsiya me de gava Neteweya Kurd dezgehîn xwe ava bikin dê ev pirsgirêk bixwe çareser binin.

Ku em vegeerin ser wêneya iroyîn, li her perçê yên Kurdistanê xebata wêneyî heye. Her çiqas li perçê û besen cûr be cûr ev xebat tê kirin, dîsa mijarek hevparî tê de heye. Ev mijar jî têkoşîna Neteweya Kurdi ye, serhildan û berxwedana Kurdi ye. Tu hêz û qewet di ber ne daye ku ev mijar di wêneyan de neyê neqşandin.

Lê gava em hunera wêneya Kurdi bi awayek teşeyî (formî) hildin destê xwe gellek gelş û gelmesê dertên ber me. Ev gelş ne bi tenê ji bo ressamîyê, ji bo her çalakiyên me henin. Bi gelemeprî di şirovehiya wêneyan de ev gelş û geremol henin. Bi kurtî bê gotin di huner de arabeskîfî heye. Ev yek ne ji bo wênetiyê, lê ji bo hemû çalakiyên hunerî hene, mîna muzîk, wêje û hwd. Ev jî ji



"Keçikîn me di işkencê de"

têgîhandinê çewt tê. Lewre hemû Neteweyîn serdest û hêzên emperyal, çanda xwe bi navê gerdünîtiyê dixwazin ku bi me bidin pejirandin. Hinek hunermendin me yên xwedê giravî bi navê gerdünîtiyê xweziya xwe bi vê çandê anîne û li gora wê berhemîn xwe afirandine.

Divê mirov xwe bi hemû nirx û rûmetên wê civakê bixemilîne wê ji nêzîk ve binase. Bi vî awayî mirov dikare xwe bigihîne mirovatiya hemdemî.

Hûn di derbarê huner de bi taybetî ji derbarê resimên ku bi gel ve ne û ji jiyana berçavî ne dûr in, ci difikirin?

Bi awayê ku min li jor jî got, huner bi jiyana gel ve divê girêdayî be. Lewre tenê dikare bi vî awayî xwe li piya bigire. Lewre hunermend û huner ji ci celebî dibe bila bibe bi çanda jiyana gel ve ye.

Anku hunera gel ew e ku xwe ji pêvajoya têkoşînê dûr nexe. Ev yek ne rast e ku gel ji huner fêmkeke û pê re pêwendiyê (têkiliyê) wî tune ne. Bi taybetî dan û standina Kurdan ya bi huner re mînakeke berçavî ye (mîşexes) yên ku vê rastiyê nabînin, bila xalî û xalîçeyen Kurdan binêrin, ev mînakeki gellek gi-ring e, mirov xalîyên Kurdi dikare mîna tabloyeke wêneyî binir-xîne. Bi sedan salan berê gelê Kurd di nav wênekariyê de jiye. Hem jî, ji wan kesen ku xwe hunermendîn hemdemî dibînin bêtir hunermend in û hin bêtir ji civatkar in. Ev yek hatîye îspat-kirin ku hunerî ji bona gel e, ji bona kesen hilberkar e.

Hûn dikarîn li ser ekolê

wêneyan (resiman) de çend gotinan ji me re bibêjin?

Gengeşîya (muneqşeya) her mezin ên ku tê kirin li ser wêneyen nedîtbar (mucerret, soyut) û figuratif in. Sosretek gelek mezin e berê ev gengişî li ser "huner ji bo gel e an ji ji bo huner e" dihate kirin. Lî iro, ev gengişî li ser nedîtbarî û figuratifîyê tê kirin. Bi awayek din gengişî ji hatîye arabesk kirin. Ên ku vê gengîşî ji dîkin derdorêن hunermend û akademîşen in. Ev kes li dervayê civakê di atolyê xwe de dijîn û li gorî xwe ji xwe re dinyayek ava kirine. Ji vê hunerî re ji dibêjin "hunera azad" û ev gotin ji sermayedartîtiyê tê û mîjîyê wî tîne bîra mirov.

Ev tiştîn ku jê re dibêjin hunera nedîtbarî tu tiştîkî nayne ber çavan û bêteşe ye. Em ji vê yekê re dikarîn bibêjin ew civata ku hatîye xerakirin, dejenere kirin ev hunermendîn wê civatîne.

Divê ku em vê yekê ji bîr nekin, ew kesen nikarîbin xwe bi gelan bidin fêmkirin û ewqas ji gelê xwe biyan binin, em nikarin ji wan re bibêjin hunermend. Divê em navek dîm ji wan re peydîbikin. Divê hunermend hûnera xwe li ser rastiya civakî ava bike.

Hûn dixwazin tiştînî din ji bibêjin?

Hunermendbûn ne karek hêsan e, kêferat, fedekarî û ber-pirsiyariyê dixwaze. Gava mirov hinek tiştan biafirine û derxe holê wê gavê mirov bi xwe şanaz dibe kîfxwes dibe. Hunermend ew in ku bi mirov fersenda esteti-ka hevpar didine qefaltinê.

Hevpeyvîn: M.Şefîfî

Di işkencê de berxwedan



- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar • Mudurê Dezgahê (Müessese Müdürü) Zübeyir Çakır
- Berpirsiyare Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyare Nivîsaran (Yaz İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres): Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D. 4 • Çağaloğlu / İstanbul • Tel: 511 57 60-511 66 02
- Fax: 511 51 57 • Berpirsiyariya a Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ